# ZANISTÊN CIVAKÎ

## SERETAYÎ

## 5

# NAVEROK

LÊVEGER ........ 8
PIRTÛKA ZANISTÊN CIVAKÎ ........ 9
KES Û CIVAK ........ 11
DI CIVAKBÛNÊ DE ROLA SAZÎBÛNÊ ........ 13
MAF Û ERKÊN ME ........ 15
MAFÊ ZAROKAN ........ 18
DI NAV DEWLETAN DE PARASTINA ZAROKAN ........ 21
GAV BI GAV BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ ........ 23
BUHARA GELAN Û RAPERÎN ........ 25
ŞOREŞA ROJAVA ........ 26
PERGALA FEDERASYONA BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ ........ 29
PERGALA RÊVEBERIYA BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ ........ 30
ŞEHÎDÊN ME ........ 36
ÇAWA DIJÎN ........ 44
ÇANDINÎ -1 ........ 45
ÇANDINÎ -2 ........ 48
LAWIRVANÎ ........ 51
DARISTAN ........ 54
PÎŞESAZÎ ........ 56
TÊKILIYÊN ABORÎ Û PÎŞEYAN ........ 59
CIHÊ KU EM LÊ DIJÎN ........ 64
AVHEWA Û BANDORÊN WÊ LI JIYANÊ ........ 67
ŞÊNÎ Û BICIHBÛN ........ 69
BOBELATÊN XWEZAYÎ ........ 72
HERIKANDINA DÎROKÊ YA DIJBER: ŞARISTANÎ ........ 78
ŞARISTANIYÊN ANADOLÊ ........ 85
ŞARISTANIYÊN HINDÊ ........ 88
ZANIST Û TEKNOLOJÎ ........ 92
HIN ZANYAR Û TAYBETIYÊN WAN ........ 95
XEYALÊN ME ........ 100

MÎRASÊN ME YÊN HEVBEŞ-1 .......... 102
MÎRASÊN ME YÊN HEVBEŞ(2) .......... 106
MÎRASÊN ME YÊN HEVBEŞ-3 .......... 110

# BEŞA 1

**1-** Lêveger
**2-** Pirtûka zanistên civakî
**3-** Kes û malbat
**4-** Di civakê de rola sazîbûnê
**5-** Maf û erkên me
**6-** Mafên zarokan
**7-** Di nav dewletan de parastina zarokan
**8-** Gav bi gav Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê
**9-** Bihara gelan û raperîn
**10-** Şoreşa Rojava
**11-** Pergala fedrasyona Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê
**12-** Pergala rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê
**13-** Şehîdên me

**WANE 1**

# LÊVEGER

**Mamoste:**

Em ê îsal refa pêncan bixwînin. Di refa çaran de, me pirtûkeke nû ya bi navê zanistên civakî dîtibû. Di vê pirtûkê de me agahiyên nû girtin. wan agahiyan jiyana me hêsantir kir. Em ê niha careke din, pirtûka ku me par biribû, dubare bikin.

Kî dikare waneyên me yên par dubare bike?

**Berfîn:**

- Mamoste me par, di pirtûka zanistên civakî de, ev wane dîtin:
  - Me cudahiyên xwe nasîn.
  - Taybetiyên me yên fîzîkî ne mîna hev in.
  - Şopa tiliyên me, rengên çavên me, dengê me, meşa me, xwîna me, heya tansiyona dilê me ne mîna hev e.
  - Me nasnameya xwe nasî.
  - Ez fêrî çîroka xwe bûm, min dîroka xwe anî gel hev, ji xwe re werîsa demê çêkir.
  - Min navdarên kurd nasîn, weke: Kerepêtê Xaço, Aram Dîkran, Ehmedê xanî, Derwîşê Evdî.
  - Çanda xwe, cil û bergên xwe nasîn.
  - Me ol û baweriya gelên derdora xwe nasîn. Dewlemendiya olan û baweriya gelan dît.
  - Di waneyên zanistên civakî de, em fêrî çêkirina nexşeyê jî bûn.

WANE 2

# PIRTÛKA ZANISTÊN CIVAKÎ

## PIRTÛKA ZANISTÊN CIVAKÎ, ÇI SÛDÊ DIDE ME?

Waneyên zanistên civakî: dîrok, erdnîgarî, aborî, felsefe, zanist, teknolojî û hwd in.

Ev pirtûk, hemwelatiyeke/î azad nîşanî me dide. Di navbera kes û civakê de, girêdaneke wekhevî û dadmendî bi rêya demokrasiyê ava dike.

### Pirtûka zanistên civakî:

1- Ji bo jiyana me hêsan bibe, agahiyan dide me û me ber bi çalakiyan ve dibe. Armanca van çalakiyan hêsankirina jiyanê ye.

2- Dîroka azadî û demokrasiya gelê me, têkoşîn û nîşaneyên wê bi me dide nasîn.

3- Mafê mirovan û mafê me bi me dide nasîn. Berpirsiyariya mirovan li hember hev dest nîşan dike. Hewl dide ku em maf û berpirsiyariya xwe fêm bikin.

4- Bi me re nêrînên zanistî pêş dixe, an jî bi me dide fêmkirin ku agahiyên di rexneyan derbas nebin ne rast in. Bingehê pêşketina şêweyên hizirînê, rexnegerî ye. Dema em fêrî rexneyê bibin, dikarin biryarên xwe bi xwe bidin. Girîngiya biryardayînê bi me dide fêmkirin. Dîsa bi me re xwestek, kêrhatin û nasîna xwe pêş dixe.

5- Pêşketina zanist û teknolojiyê bi me dide nasîn. Sûd û ziyanên wan çi ne, li jiyana me çawa bandor dikin, dide nîşandan.

6- Me fêrî jiyana hevbeş dike. Mirov zindiyekî ku bi hev re wek civak dijî. Bi hev re jiyîn û alîkarîdayîn bingehên wê ne.

7- Mirov çawa debara xwe dikin, bi me dide nasîn. Li derdora me, çi çalakiyên aborî hene, ev çalakî li jiyana mirovan çawa bandorê dikin û tevlîbûna wan çalakiyan çawa dibe, bi me dide fêrkirin.

8- Têkiliyên me û cîranên me, gelên din çawa ne, pêwîst e çawa bin û têkiliyên aborî û çandî çi ne, bi me dide fêrkirin.

9- Têkiliyên di navbera mirov û civakê de, bi me dide nasîn. Li hember civakê erkên me çi ne, civakbûnê çawa pêş bixin, sûdên

civakbûnê çi ne, bi me dide nasîn. Dîsa ji bo civakeke bi tenduristî û zanist, pêwîstiya bi kesayetên azad dest nîşan dike.

**10-** Hawirdor û xwezaya xwe nasîn, têkiliya hawirdor û mirov çi ye û jîngehparastin çi ye bi me dide fêrkirin. Di jiyana mirovan de, cihê jîngehê çi ye, Bi me dide nasîn.

**11-** Çanda me ya netewî bi me dide nasîn. Çand çi ye, çawa çêbûye, çandên cuda çi ne, ferq û cudahiya di navbera çandan de çi ye û girîngiya xwedîderketina li çanda xwe çi ye, bi me dide nasîn.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

Bihizirin û gotûbêj bikin.

**1-** Hemwelatiya/ê azad çi ye?

**2-** Çima girîng e ku em bibin hemwelatiyekî/e azad?

**3-** Di bûyîna hemwelatiyekî/e azad de, rola waneyên zanistên civakî çi ye? Nêrînên xwe binivîse, bi mamoste û hevalên xwe re gotûbêjê bike.

WANE 3

# KES Û CIVAK

Civak, ji mirovan çêdibe. Ji her mirovekî re kes, tê gotin. Di jiyana xwe ya rojane de, hinek dikarin kar bi tena serê xwe bikin, lê hinek nikarin kar bi tena serê xwe bikin. Dema ku mirov tên gel hev komekê çêdikin. Karê ku kesek nikare bike, bi hev re komî dikarin bikin.

Bi armanceke hevbeş, ji duyan pirtir, dema ku mirov tên gel hev komekê ava dikin. Di hemû jiyana me de, em bi koman re dijîn weke: malbat, xizm, dibistan, cihê kar û hwd.

Nasîn, fêmkirin û pêkanîna çanda civakê bi xwe re, civakbûnê çêdike. Di dema civakbûnê de, mirov fêrî nirxên civakê dibe û kêrhatiyên xwe bi pêş dixe.

Mînak: Sibehê di malê de, dema ku ji xew radibin, ji endamên malê re dibêjin roj baş û bi rûkenî nêzîkî wan dibin, ev nîşaneyên civakbûnê ne. Dema ku em diçin dibistanê rewşa hevalên xwe dipirsin û parve dikin ev jî nîşaneyên civakbûnê ne. Ev jî têkiliyên rast pêş dixe.

**Bijîşkên psikolojî dibêjên:** Kesên ku civakbûna xwe bi pêş dixin, baştir û hêsantir tevlî civakê dibin û di jiyana xwe de, pir bi coş dibin.

Ev rewş bi kesan re baweriyê bi pêş dixe. Xwe bi xwe biryaran digirin. Kêrhatiyên bi hevrekarkirinê bi pêş dixe.

## MALBAT



**Malbat**, koma herî biçûk a civakê ye. Em pêdiviyên xwe yên bingehîn bi alîkariya malbatên xwe distînin. Malbat civakbûyîna me ya destpêkê ye. Tiştên ku derbarê jiyanê de ne, me fêr dike. Ji zaroktiyê heya mezinbûnê, malbatên me pêdiviyên me pêk tînin. Em pêdiviyên xwe yên heyberî û rewanî, hezkirin û rêzgirtinê jî ji

malbatên xwe distînin. Bi malbatên xwe re kêfxweş dibin an jî diêşin. Zarokên ku di malbatê de, civakbûyîneke baş jiyan neke di pêşerojê de, di jiyana wî de, pir pirsgirêk li pêşiya wan derdikevin.



Civakbûyîna yekê di nav malbatê de çêbe jî, xizmê me jî bandoreke mezin li civakbûyîna me dikin. Bi xizmên xwe re mayîn, mirovan kêfxweş dike. Xizmên me di rojên zor de, xwedî li hev derdikevin.

Hevalên me jî bandorê li civakbûyîna me dikin. Di zaroktiya me de, hevalên me çêdibin. Em bi hevalên xwe re dilîzin û demeke xweş derbas dikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1-** Çima mirov kom jiyan dike?

**2-** Nîşaneyên civakbûyînê, çi ne?

**3-** Hin mînakên civakbûyînê bide.

**WANE 4**

## DI CIVAKBÛNÊ DE ROLA SAZÎBÛNÊ

Em bi serê xwe, nikarin pirsgirêkên perwerde, tenduristî, ewlekarî, çûn û hatinê çareser bikin. Ji bo ku ev pirsgirêk bên çareserkirin, hin sazî hatine avakirin. Ev sazî, ji bo berjewendiyên civakê kar dikin, an jî ji bo civakê berheman diafirînin. Ev pirsgirêkên ku em bi serê xwe nikarin çareser bikin, bi rêya van saziyan çareser dikin û ev sazî di civakbûyînê de, roleke mezin dilîzin.

**Mînak:** Dibistan, ji bo civakeke bitendurist roleke pir girîng dilîze, bi mirovan re civakbûyînê pêş dixe. Di dibistanê de, têkiliyên ku em bi mamosteyan an bi hevalên xwe re an jî bi rêveberiya dibistanê re û bi kesên ku li dibistanê kar dikin, deynin, di civakbûyîna me de roleke girîng dilîze. Saziyên ku di nav dibistanê de hatine avakirin, civakbûyîna me xurtir dike.





Di dibistanan de tîmên gogê, komên hunerî û komên cur bi cur tên rêxistinkirin. Di nav van koman de, bi hev re karkirinê, fêrî alîkariya hev dibin û hestên me nêzîkî hev dike. Di komên hunerî de, ji bo nêrînên cuda nas bikin, hev guhdar dikin, hest û ramanên xwe bi rêya hunerê tînin ziman.

Di nava van koman de, hin kar dikevin ser endamên komê. Ji karê ku dikevin ser endamên komêre, erk tê gotin. Heger her kes bi erkê xwe rabe, kom bi ser dikeve.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Hûn di nav kîjan koman de,  cih digrin.

2- Di van koman de,  çi erk dikeve ser milê we? Nêrînên xwe bi heval û mamosteyên xwe re parve bikin.

**WANE 5**

# MAF Û ERKÊN ME

Nivîskî, an jî ne nivîskî, kesayetî an jî civakî hin destkeftiyên mirovan hene ji van destkeftiyan re,  maf tê gotin. Koma ku em tê de, cih digrin mafên me tê de cuda dibin. Hin maf xwezayî ne wek: mafê jiyanê, mafê xwendinê, mafê jiyana bitendurist û bi ewle jiyankirin. Ev maf  ji bo her mirovekî derbasdarin û ev mafên wan ji destên wan nayên stendin.

Li gel van mafan, berpirsiyariyên me, an jî erkên ku em bi cih bînin jî hene. Berpirsiyarî ew e ku her mirov, encamên çalakiyên xwe bigre ser milên xwe. Di nav civakê de an jî di nav komê de, erkên ku dikevin ser milên me,  pêwîst e em pêk bînin,
Wek: hewşa xwe paqijgirtin, alîkarîdayîn, ji kesê din re rêzgirtin, erkên me ne. Di dibistanê de çêkirina karê malê, bikaranîna amûr û paqijgirtina dibistanê, pêkanîna rêgezên dibistanê erkên me ne. Ev erk, him  ji bo me, him jî  ji bo mirovên din re ne. Pêkanaîna erk û berpirsiyariyan, karê bibername, girîng e.



Ji bo ku  karek bi encam bibe, em kengî bikin û çi bikin jê re bername tê gotin. Rêya  serkeftinê bi bername karkirin e. Bi bernameyê em  karê xwe di dema wê de, bidawî dikin. Bi bernamekarkirin, taybetiyên mirovên serkeftî ye.

Berovajî vê, kesên ku karên xwe bêbername bikin, kengî çi bikin ne diyar e, ji serkeftinê dûr in. Belavbûn û xemsarîr taybetiyên mirovên lawaz in û encamên baş nagirin.

Carinan  em dibihîzin ku hin mirov dibêjin dem, têra me nake. Gilî û gazinên wan li ser demê hene. Li vir pirsgirêka bingehîn ne kêmbûna demê ye, lê belê dema xwe baş bi bername nekirine. Dema ku dem baş neyê bernamekirin, dem têra mirov nake.  Ji bo dem têra me bike û em encamên baş bigrin, pêwîst e em dema xwe bi bername bikin. Ji bo wî jî:

1- Karên ku em dixwazin bikin.

2- Karên ku pêwîst e em bikin.

Dema ku me dema xwe ser van karan dabeş kir, em ê encamên baş bigrin.

Mînak: Xwendina waneyan, çêkirina karê malê, çûyîna dibistanê, razan, xwarin û karê ku pêwîst e em bikin; bi lîstokan lîstin û bi karanîna amûrên teknîkê ew ji karên ku em dixwazin bikin. Dema ku em bernameyê amade bikin wan di ber çavan re derbas bikin. Hevsengiyekê di jiyana xwe de, çêkin. Di rojê de, dema xwe li ser karekî derbas nekin, ev rewş, mirovan dike yek alî.

Mînak: tenê xwendina waneyan, lîstin an jî temaşekirina televizyonê ne rast e. Bi bernamekirina demê re em dikarin dema xwe rêxistin bikin û bi rêve bibin. Kengî çi bikin, em ê diyar bikin.



Xwendina pirtûkan taybetiyeke baş e. Him agahiyên me dewlementir dike, him jî hizrandina me, ramanên me berfireh dike. Ji ber vê yekê, pêwîst e em xwendina pirtûkan, bikin beşek ji jiyana xwe û jê re demê veqetînin. Ji bo lîstokan jî dema xwe diyar bikin û hemû dema xwe bi lîstokan derbas nekin. Di jiyana me de, bila demeke ji lîstokan re jî hebe.



Heger em bi armanc û bi bername amûrên teknîkê bi kar bînin, em ê encamên baş bigrin û zanebûna xwe xurt bikin. Lê heger bê armanc û bê bername em van bi kar bînin, wê demê, dê dema me vala biçe û em ê tu sûdê jî ji wan amûran negirin.

Ji bo jiyanek bitendurist pêwîst e li gorî pêdiviya xwe xew bikin. Bila dema xewa me jî diyar be û bê serober xew nekin. Divê em heta derengê şevê şiyar nemînin û bi roj jî dereng ji xewê şiyar nebin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

Tabloya li jêr dagirin:

| **Kom an sazî** | **Rola me** | **Erk û berpirsiyariyên me** |
|---|---|---|
| Malbat | Zarok | |
| Dibistan | Xwendekar | |
| Şano | Lîstikvan | |
| Tîmên gogê | Parazvanên kelihê | |

**WANE 6**

# MAFÊ ZAROKAN



Di nava hemû zindiyan de, yê herî zêde pêwîstiya wî bi parastinê heye, **mirov** e. Zindiyên din piştî çêbûna wan bi demekê dikarin jiyana xwe berdewam bikin. Lê mirov ne zindiyekî wisa ye. Di berdewamkirina jiyana wî de, pêdiviya wî bi civakbûyîn û parastinê heye. Li hember xeteriyan em parastina destpêkê li malbatê dibînin. Ji çêbûnê heya demeke dirêj, pêdiviyên me yên jiyanê û tîmarbûna me malbat pêk tîne. Dîsa perwerdeyên destpêkê û civakbûyînê li malbatê fêr dibin.



Zarok, ji mezinan cudatir in. Taybetiyên wan yên fîzîkî û psikolojîk cuda ne. Mezinkirin û perwerdekirina zarokan karekî civakî ye û pêwîst e bi rengekî zanistî (heyberî-rewanî) nêzîkatî ji zarokan re bê kirin. Di cîhanê de, li ser vê mijarê hişmendiyeke hevbeş her ku diçe bi pêş dikeve. Yekîtiya Neteweyan di 20 mijdara 1989'an de, peymana mafê zarokan eşkere kir. Du dewletên ku ne endamên Netewên Yekbûyî ne, ev yek nepejirandine, lê 193 dewletan ev peyman pejirandine û erê kirine.

**Hin biryarên vê peymanê ev in:**

1- Malbata me rêbera me ya jiyanê ye û ji bo bikaranîna mafên me alîkariyê dide me.
2- Ziyanê nede me.
3- Divê dewlet li hemberî rêveberî û daxwazên dê û bavên me rêzdar be.
4- Em hemû heya hejdeh saliya xwe zarok in.
5- Dewlet neçar e ku rê li ber bikaranîna hemû mafên me veke.
6- Eger bi awayekî em zagonan bin pê bikin jî, tu kes nikare li hemberî me zordariyê tevbigere û me kêm bikin.

Her çiqas ser navê zarokan peymanek hebe jî lê ev peyman di hemû cihan de, wek hev nayê pêkanîn. Pir mafên zarokan tên xwarin û bin pê kirin. Neşandina zarokekan a dibistanê, binpêkirina mafê perwerdeyê ye. Di şer de, girtina zarokan ji bo armancên leşkerî, bi zor di karekî de, dane karkirin, binpêkirina mafê wan e.

Ji bo ku mafên zarokan bên parastin, binpêkirinên ku di vê mijarê de, tên jiyankirin ji holê bên rakirin, erkên mezin dikeve ser saziyên sivîl, civaka sivîl, mirovên hestiyar û hişmendiyên pêşketî. Pêwîst e raghandin û tora medya civakî di vê mijarê de, şiyariyê bidin.

Ji bo vê yekê di nava Netewên Yekbûyî de, saziyên ku bi mafê zarokan radibin hatine avakirin.Her wiha di her welatekî de, saziyên bi vî rengî hatine avakirin.



## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Dema ku mafê zarokan tê gotin, çi tê mejiyê te, bi hevalên xwe re parve bikin.

**WANE 7**

## DI NAV DEWLETAN DE PARASTINA ZAROKAN

### UNICEF (Yunisêf):

Unicef, di sala 1946'an de, Netewên Yekbûyî wek sazî hat avakirin û ji bo zarokan alîkariyên lezgîn hatin dayîn. Di sala 1954'an de, armancên avabûna xwe li ber çavan derbas kirin, peyvên lezgîn ji navê xwe derxistin. Armanca wê parastina mafê zarokan, alîkariya ji bo pêdiviyên zarokan e û ji bo potansiyelên wan derkevin holê, derfet avakirin.

Unicef, kar û xebatên xwe li gorî peymana mafê zarokan dimeşîne. Ev peyman, di her cihî de, bi cih û domandinê kirine, pîvanên sincê ava kirin û li cîhanê di her cihî de, wekheviyê bingeh digire. Pêşxistin, parastin û danîna jiyankirina zarokan, di pêşketina mirovahiyê de, pîvaneke bingehîn dibîne.

Unicef, di nav zarokan de ji kesên herî bêderfet an jî di bin fişarê de ne bingeh digire. Bi taybet zarokên ku bûne qurbanên şer, zarokên ku tundiyê dibînin, zarokên ku xizaniyeke mezin jiyan dikin û hwd.

Netewe, ziman, ol, mezheb û zayend bingeh nagirin. Di navbera zarokan de cudahiyê çênake, wek hev nêzîkî zarokan dibe. Lê her çiqas di peymana Unicef de, ev hatibe nivîsandin jî ji ber ku bi dewletan re kar dike, xwe têkilî zarokên ku tundiya dewletê dibînin, nake. Hin caran bi ramyarî jî nêzîk dibe. Berjewendiyên dewletan bingeh digire.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1-** Li derdora we, mafê zarokan çiqasî tê parastin?

**2-** Hûn wek zarok, çiqasî mafê xwe dizanin û jê sûd digire ?

**3-** Li derdora we, bûyerên ku mafên zarokan bin pê dike çêdibin? Heger çêdibin, ji bo derbaskirin û sererastkirinê pêwîst e çi bê kirin? Lêkolîn bikin, encama wê bi heval û mamostên xwe re parve bikin.

**WANE 8**

## GAV BI GAV BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

Di civakbûyîna mirovan de, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê cihekî girîng digire. Dîroknas û arkologan ev herêmê weke "Kevana Zêrîn" bi nav kirine. Ji çiyayê Amanosê dest pê dike li çiyayê Zagrosê bi dawî dibe. Di vê herêmê de, bi dehan gir hatine kolan. Ji van giran tiştên ku derketine vê şîroveyê piştrast dike, wek; Girê Reş, Tilhelef, Girê Moza, Tilbênder, Tilhemîs û bi dehan cihê wek van di vê herêmê de hene. Hin ji wan cihê dîrokî hatine vekolan û hin ji wan ne hatine vekolan.



**TIL BÊNDER**

Ji ber ku ev der li sererd û binerda wê dewlemend e, bala her kesî kişandiye. Bi avabûna Someran, li ser vê herêmê êrîş, talan û şer dest pê kirine. Piştî Someriyan Akad û Babiliyan jî ev siyaset meşandine. Hêzên ku xwestine li cîhanê bibin desthilatdar berê xwe dane vê herêmê. Ji aliyê rojhilat ve Pers, Sasanî û Sefewî, ji aliyê rojavayê Kurdistanê ve, Iskenderê Makdonî, Romayê berê xwe dane vir û ev herêm bûye qada şer. Bi islamê re jî ereb û moxul û di dawiyê de, Turkan jî ev herêm kirine cihê şer.



**TIL HELEF**

Nêzî 400 salî ev herêm di bin bandora Turkan de dimîne. Di şerê cîhanê yê yekem de, ev der ket bin bandora Firensayê. Di 21.1. 1921'ê de, Firensa bi tirkan re bi navê “Peymana Enqerayê” peymanek çêkir û ev herêm ji bakurê Kurdistanê qut kir. Frensa nêzî 30 salî li vê herêmê desthilatdariya xwe meşand, piştre vekişiya û rêveberiyek bi xwe ve girêdayî ava kiriye.



**GIRÊ MOZA**

Ev rêveberiya ku Firensayê da avakirin, her ku diçû nijadperestî pêş dixist û hebûna gelan nas nedikir. Gelên ku di vê herêmê de dijiyan, perçiqandin. Bi zorê pişaftin pêş dixist. Bi siyasetên cuda jiyana hevbeş ruxandin, gelên ku li vê herêmê dijiyan, ew kirin dijminên hev. Di sala 1962'an û şûndetir de, mafê hemwelatiyê jî neda kurdan.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

Lêkolînekê li ser cihekî dîrokî yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bikin. Piştre bi mamoste û hevalên xwe re gotûbêjê bikin.

**WANE 9**

## BUHARA GELAN Û RAPERÎN

Zilm û zora dewletên Rojhilata Navîn, di gelan de teqandinek çêkir. Di serî de gelê Tunisê rabû ser piyan û jiyana di bin fişarê de, nepejirandin. Li hemberî berxwedana gelê Tunisê, serokê Tûnisê, dev ji desthilatdariyê berda û reviya.

Ev pêlên berxwedanê bandora xwe li derdora xwe jî kirin. Piştî Tunisê, li Lîbya û Misirê jî berxwedana gelan pêş ket. Li hemberî berxwedana gelan, desthilatdariya Misir û Lîbyayê guherî. Lê ev rewş ji herêmê re aramî û aştî neanî, alozî kûrtir kir.

Di 11.2.2011'an de, li bajarê Derayê hin xwendekar li dijî rêjîmê berxwedanî dan destpêkirin. Ev berxwedanî, çiqasî hatibe perçiqandin jî bandora xwe li tevahiya Sûriyeyê û Rojava kir. Di gelên Sûriyeyê û Rojava de, şiyarbûnek çêkir û gel kişand nava berxwedanê.

Di 2012'an de hin cih, ji destê rêjimê hatin derxistin û rizgarkirin. Lê di demek kurt de ev herêm, ji daxwazên azadî û wekheviyê dûr ketin. Bi taybet hêzên ku bi fikir û ramanên Selefiyan xwe bi rêxistin kirin, desthilatdarî xistin destên xwe. Ew rewş heta şoreş jî guherand û berovajî kir. Hin dewletên ku dixwestin di Rojhilata Navîn de bibin desthilatdar û xwestin ji rewşê sûd bigrin, ji bo vê alîkarî dan rêxistinên Selefî. Buhara gelan ji rê derket û ji armanca xwe dûr ket.

**WANE 10**

# ŞOREŞA ROJAVA

## 19 TÎRMEHÊ:

Li hemberî siyaseta pişaftin û tunekirina kurdan, kurdan her tim li ber xwe didan û xwe bi rêxistin dikirin. Di 19 Tîrmeha 2012'an de, bajarê Kobanê ji rêjîmê hat rizgarkirin. Roja piştî wê, bajarê Efrîn û derdora wê jî hatin rizgarkirin. Di 21 Tîrmeha 2012'an de, bi temamî herêmên Cizîrê ji bilî çarkoşek parastinê (çarkoşeya ewlekariyê) ji Qamişlo û Hesekê hatin rizgarkirin û rêjîm hat derxistin, ev bû bingeha Şoreşa Rojava.

Gelê kurd, di demek kurt de, xwe bi rêxistin kir, sazî û dezgehên xwe ava kirin. Ev pêşketinên kurdan ji aliyê hin dewletên dagirker û rêxistinên Selefî nehat pejirandin. Rêxistinên Selefî bi alîkariya dewleta Tirk, êrîşî Serê Kaniyê kirin. Bi vî awayî şerê kurdan û Selefiyan dest pê kir.

## YEKÎNEYÊN PARASTINA GEL (YPG):




Gelê kurd, bi navê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) xwe bi rêxistin kirin û li hemberî êrîşên Selefî û dewleta Tirkiyeyê berxwedanî kirin. YPG, rêxistinên Selefiyan têk birin û bajarê Serê Kaniyê ji Selefî û dagirkeriya Tirkan rizgar kir.

Kurdan xwe wek kanton bi rêxistin kirin.Sê kanton (Cizîrê, Kobanê û Efrînê hatin ragihandin. Her çiqas ev kanton ji aliyê hêzên Selefî ve ji hev hatibin veqetandin jî xwe bi rêxistin kirin û xwe parastin.

## DAIŞ:

Bi binketina Cebhetenusra, rêxistineke Selefî nû derket ser dika dîrokê, ji Îraqê dest pê kir û ji 2014'an şûndatir li Sûriyayê hebûna xwe diyar kir . Bi navê "Dewleta Islamî" dest bi êrîşên hovane kirin. Di demek kurt de, herêmeke mezin xist bin bandora xwe. Li Îraqê bajarê Mûsilê û li Sûriyeyê bajarê Reqayê dagir kirin. Bajarê Reqayê kir paytexta xwe û bi navê "Dewleta Islamî ya Îraq û Şam- DAIŞ" dewleta

xwe ragihand. Reqa, Tebqa, Dêrazor, Minbic, Cerablos, Girê Spî, Bab û hin deverên din dagir kirin.

## BERXWEDANA KOBANÊ:

Di dawiya 2014'an de Daiş, êrîşî Kobanê kir û bi kurdan re şer kir. Di demek kurt de, pir cihên Kobanê dagir kir. Bi pêşengtiya kurdan berxwedana gelan dest pê kir, bi berxwedaneke bêhempa Daiş li Kobanê bi bin ket. Cara yekem, Daiş, li Kobanê bin dikeve . Ew binketina Daişê, rê ji şikandina wê re vekir. Girê Spî ji Daişê hat rizgarkirin û di encamê de Cizîr û Kobanê gihiştin hev.

Bi rizgarkirina Kobanê û gihaştina hev a her du kantonan, bi gelên Sûriyeyê re, baweriyek da çêkirin ku Daiş wê têk biçe. Li her deverê li hemberî Daişê berxwedanî pêş ket. Her bajarekî ji xwe re encûmenek leşkerî ava kir û hêzên çekdar di bin vî navî de, kom kirin.

## HÊZÊN SÛRIYEYA DEMOQRATÎK (HSD):

Di 12'ê Cotmeha 2015'an de, li hevkirina sêzdeh hêzên çekdarî bi navê Hêzên Sûriyeya Demoqratîk (HSD) hat damezirandin. Kurd, ereb, asûr, ermen û gelên ku di herêmê de, dijîn beşdarî vê hêzê bûn.

## ENCÛMENA DEMOQRATÎK A SÛRYEYÊ (MSD)

Di 8 Berfenbara 2015'an de, li Dêrikê civînek hat li darxistin. Kurd, suryan, ereb û gelên ku li herêmê hene tevlî civînê bûn. Di vê civînê de, Encûmena Demoqratîk a Sûriyeyê (MSD) hat ragihandin û li dijî Daişê têkoşîn bilind kir.

Hêza Sûriyeya Demoqratîk, bi alîkariya hêzên hevpeyman li dijî Daişê di 27'ê Berfenbara 2016 'an bendavaTişrînê hat rizgarkirin. Di 15 Gelawêja 2016'an de, di pêşengtiya Encûmena Leşkerî ya Minbicê û bi alîkariya hêzên hevpeymana navnetewî Minbic ji dagirkeriya Daişê hat rizgarkirin.

Di 10'ê Gulana 2017'an de, bajarê Tebqayê û derdora Çemê Firatê ji çeteyên Daişê hatin rizgarkirin.

Di 14'ê Cotmeha 2017'an de, bajarê Reqayê paytexta Daişê jî hat rizgarkirin. Rizgarkirina Reqayê, di avakirina Federasyona Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de, cihekî girîng girt. Daiş her ku çû ji ser axa Bakur û Rojhilatê Sûiyeyê hat tunekirin. Di Newroza 2019'an de, bi rizgarkirina Dêrazorê re Daiş, li ser axa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat tunekirin.

Bi têkbirina Daişê re, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pergalek hat avakirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

Li ser şoreşa Rojava lêkolînekê bikin.

WANE 11

# PERGALA FEDERASYONA BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

Gelên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijiyan, xwe li derdora pergala Rojava girtin û xwe bi rêxistin kirin. Vê yekîtî û birêxistinbûnê, Daiş ji herêmê derxist. Bi vî awayî pergala Rojava firehtir bû. Vê firehbûnê xwe bi Federasiyona Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi nav kir.

Vê pergalê li ser du beşan xwe bi rêxistin kiriye. Beşa yekem beşa civakî ye, beşa duyem jî beşa rêveberiyê ye.

Beşa civakî, li ser birêxistinkirina civakê pêş dikeve. Ji komînan dest pê dike heya encûmena giştî diçe. Komîn û encûmen bingehên birêxistinbûnê ne. Her gel, her bawerî û her beşê civakê dikare komîn û encûmena xwe ava bike û xwe tevlî pergalê bike.

**ARMANCA VÊ PERGALÊ:**

1- Avakirina welatekî hevbeş
2- Bi hev re jiyîna hemû gel û baweriyan an jî Neteweya Demokratîk
3- Makezagoneke Demokratîk
4- Azadiya jinê
5- Parastina cewherî
6- Aboriyeke civakî
7- Azadiya çand û ziman

Ev hemû encax bi Federasyoneke Demokratîk pêk bên. Sûriyeyeke Demokrat, Kurdistaneke azad wek armancên vê pergalê ne.

**WANE 12**

# PERGALA RÊVEBERIYA BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

Pergala rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, xwe dispêre encûmena giştî. Encûmena Sûriyeya Demokratîk (MSD) bi vî karî radibe. Encûmen û komîn bingehên rêxistin û pergala rêveberiyê ne.

Pergala rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ji heft herêmên xweser pêk tên. Ew jî ev in:

1. Herêma Cizîrê
2. Herêma Firatê
3. Herêma Efrînê
4. Herêma Minbicê
5. Herêma Tebqayê
6. Herêma Reqayê
7. Herêma Dêrazorê

## 1. Herêma Cizîrê:

Herêma Cizîrê, ji du kantonan pêk tê. Kanton jî wek gund, navçe û herêm xwe bi rêxistin dikin.

- Kantona Qamişlo
- Kantona Hesekê

### ⦿ Kantona Qamişlo:

Di nav xwe de dibe du beş:

- Herêmên Qamişlo
- Herêmên Dêrikê

- Herêma Qamişlo: Ji navenda bajarê Qamişlo û navçeyên Amûdê, Tirbespiyê, Tilhemîs, Tilberek û gundewarên wan pêk tê.
- Herêma Dêrikê: Ji navenda bajarê Dêrikê û navçeyên Girkê Legê, Tilkoçer, Çilaxe û gundewarên wan pêk tê.

**⦿ Kantona Hesekê:**

**Di nav xwe de dibe çar beş:**

- Herêma Tiltemir
- Herîma Serê Kaniyê
- Herêma Dirbêsiyê
- Herêma Hesekê

- **Herêma Tiltemir:** Ji navenda bajarê Tiltemirê û gundewarên Çemê Xabûr pêk tê.
- **Herêma Serê Kaniyê:** Ji navenda bajarê Serê Kaniyê û Zirganê pêk tê.
- **Herêma Dirbêsiyê:** Ji navenda bajarê Dirbêsiyê û gundewarên wê pêk tê.
- **Herêma Hesekê:** Ji navenda bajarê Hesekê, Şedadê, Erîşa û Holê pêk tê.

**2- Herêma Firatê:**

Herêma Firatê jî ji du kantonan pêk tê. Ev kanton jî wek gund, navçe û herêm xwe bi rêxistin dikin.

⦿ Kantona Kobanê

⦿ Kantona Girê Spî

**⦿ Kantona Kobanê:**

Kantona Kobanê, di nava xwe de, dibe du herêm:

- Herêma Kobanê
- Herêma Sirînê

- **Herêma Kobanê**: Ji navenda bajarê Kobanê, navçeya Şeranê, Qenaya û gundewarên wan pêk tê.

- **Herêma Sirînê:** Ji navenda Sirînê, navçeya Çelebiyê û gundewarên wan pêk tê.

**⦿ Kantona Girê Spî**

Kantona Girê Spî jî di nava xwe de, dibe du navçe:

- Navçeya Eynîsayê

- Navçeya Silûkê

- **Navçeya Eynîsayê:** Ji navenda bajêr û gundewarên wê pêk tê.

- **Navçeya Silûk:** Ji navenda bajêr û gundewarên wê pêk tê.

### 3- Herêma Efrînê

Herêma Efrînê di nava xwe de, dibe du kanton. Xwe wek kanton, herêm, navçe û gund bi rêxistin dike.

- Kantona Efrînê
- Kantona Şehbayê

**Kantona Efrînê:**


Kantona Efrînê di nava xwe de, dibe sê herêm:

- Herêma Efrînê
- Herêma Cindirêsê
- Herêma Racoyê

- **Herêma Efrînê:** Ji navenda bajêr, navçeyên Mabata, Şêrewa, Şera, Meydankê û gundewarên wan pêk tê.
- **Herêma Cindirêsê:** Ji navenda bajêr, navçeya Şiyê û gundewarên wan pêk tê.
- **Herêma Racoyê:** Ji navenda bajêr, navçeya bilbilê, Meydana, Badîna û gundewarên wan pêk tê.

**Kantona Şehbayê:**

Kantona Şehbayê ji herêma Tilrifet, navçeyên Fafîn, Kefer Naya, Ehrez û gundewarên wan pêk tê.


BAKURÊ SURIYEYÊ
EFRÎN
FERAT
CIZÎR
Efrîn
Şeheba
GirêSpî
Kobanê
Hesekê
Qamişlo
Raco
Cindrês
Efrîn
TilRifat (Erfad)
Silûk
ÊnÎsa
Sirîn
Kobanê
TilTemir
SerêKaniyê
Dirbêsiyê
Hesekê
Dêrik
Qzmişlo
Bilbilê
Meydana
Behdina
Cindirês
Şiyê
Şêrewa
Mabata
Şêran
Meydunkê
Ehraz
Fafîn
Kefer neya
Çelebiyê
Kobanê
Qenaya
TilTemir
Çundewarên
ÇemêXabûr
SerêKaniyê
Zirgan
Dirbêsiyê
Çundewarên
Dirbêsiyê
Şedadê
Erîşa
Hol
CirKêlegê
TilKoçer
Çilaxa
Amûdê
TirBespiyê
TilHemîs
TilBerak
FEDRALÎ
IQIÎM
KANTON
HERÊM - MENTÎQE
NAHIYE

Herêmên ku nû ji bin dagirkeriya Daişê hatine rizgarkirin, xwe weke encûmen bi rêxistin kirine. Encûmena Minbicê, Encûmena Tebqayê, Encûmena Reqayê û Encûmena Dêrazorê. Her encûmenekê xwe û gundewarên xwe bi rêxistin kiriye. Van herêman, weke Rojava mîna kantonan xwe bi rêxistin nekirine.

## PERGALA RÊVEBIRINA BAJARÊ ME

Hinek ji me li bajêr, hinek li navçe û hinek jî li gundan dijîn. **Ev cihê ku em lê dijîn, xwe çawa bi rê ve dibin?**

Federasyona Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, beşek ji Sûriyeyê ye. Armanca wê demokratîkirina Sûriyeyê ye. Sûriyeke demokrat û Kurdistaneke azad armancên wê yên bingehîn in. Ev armanc ji bo pêkhateyên din jî derbasdar in, ji navendbûnê dûr in û demokrasî û xweseriya herêman bingeh digirin. Ev federasyon xwe li ser herêm û kantonan bi rêxistin dike. Di peymana civakî de, ev rewş wisa tê pênasekirin.

**"Rêveberiya Xweseriya Demokratîk netew dewletê, dewletên olî û leşkerî, desthilatdariyê û rêvebirina navendbûnê napejirîne"**

**"Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji demokrasî, pirbûn û lihevhatinê re vekiriye. Hemû gel, çand û netew bi sazî û hişmendiyên xwe, xwe rave dikin."**

Pergala rêvebirina xweseriya demokratîk rasterast bi demokrasiyê pêk tê. Demokrasî jî bi rêya komîn û encûmenan pêk tê. Ji derveyî demokrasiyê rêbazê rêveberiyeke din napejirîne.

Ev pergal xwe li ser civakeke birêxistinkirî dide avakirin. Bi vê birêxistinbûnê ji hemû pirsgirêkên xwe re, çareserkirinê bingeh digire. Guftûgo, biryargirtin û pêkanîna hişmendiya wê, bingeh e.

Li gorî hejmara şêniyan komîn an encûmen tê avakirin. Di gund de her kes endamê komînê ye û mafê wî heye ku tevlî guftûgoyê bibe, biryaran bistîne û pêk bîne. Rêveberiya her komînê heye û ev rêveberî ji aliyê endamên komînê ve tên hilbijartin. Ji jor ve erkdarkirinê napejirîne.

Gundê mezin, an jî navçe û bajar jî bi encûmenê tên birêvebirin. Encûmen, bi dengê kesên ku di wê herêmê de dijîn, tê hilbijartin. Her encûmen rêveberiya xwe û komîteyên xwe yê kar ava dike. Ev rêveberî

an komîte bi serê xwe biryaran nastînin, biryarên ku encûmenê standine pêk tînin.

Encûmenên bajar û kantonan jî bi vî rêbazî tên hilbijartin û kar dikin. Rêveberî ji desthilatdariyê pirtir, karan kordîne dike.



## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Armancên Pergala Rêveberiya Xweseriya Demokratîk çi ne?
2- Pergala Rêvebiriya Xweseriya Demokratîk li gundan çawa ye?

**WANE 13**

## ŞEHÎDÊN ME

### Şehîd Hêlîn:




Şoreşa Rojava ku bi pêşengiya jinê bû Şoreşa gelan di heman demê de, bala tevahî jinên Şoreşger yên cîhanê kişandiye ser xwe. Li ser vê rastiya ku di nava xwe de, felsefeya jiyana azad û bi hev re bûyîna gelan digire roj bi roj mezin dibe. Bi vê yekbûnê re ji hemû netewan jin tevlî vê rastiyê bûn û bûn perçeyek ji vê Şoreşê. Yek ji wan Ş. Hêlîn e.

Navê wê Ana Montgemerî Kamil e, Navê tevgerî Hêlîn Qereçox e

Di sala 1991'an de, li East Sussex ji dayîk bûye.

Di 2017'an de, tevlî YPJ' ê dibe.

Yekem jina Birîtanî ya ku tevlî nava refên YPJ ê dibe ye.

Di 15'ê avadara 2018'an de, li Efrînê bi sedema bomebebarana hewayî ji aliyê Tirkiyê ve şehîd bû.

Hatina Şehîd Hêlîn a Rojava, ji ber baweriya wê a bi xebata ji bo cîhaneke azad, wekhev û sincî bû. Ji ber ku ew bi tevahî ji têkoşînê re ji bo azadîxwaziya jinê li çar aliyên cîhanê, dilsoz bû.

Ş. Hêlîn di dilê xwe de, miroveke pir zelal bû û her kesê ku ew nas dikir yekser jê hez dikir. Ew di helwestên xwe de, ji bo derdora xwe pir zelal bû. Ew li dijî hiyerarşî û serdestiya her tiştê zindî têdikoşiya. Wê li dijî hemû girtîgehan û sînorên ku ji bo mirovan hatine rewakirin û li dijî dîwarên ku di kapîtalîst, koçberî û dewletan de, hatine çêkirin, şer kiriye.

## Fêsel Ebû Leyla




Navê wî  Fêsel Ebdî Sedûn e.

Ji gundê Qererişk yê girêdayî Kobanê ye.

Lê malbata wî ji ber sedemên cur bi cur koçî Minbicê bûne.

Di sala 1984’an de,  li  Minbicê ji dayîk bûye.

Weke kesayeteke têkoşer mezin dibe. Dizewice û keçeke wî çêdibe navê wê dike Leyla.

Navê xwe dike, Ebû Leyla.

Dema buhara gelan dest pê kir. Li Sûriyeyê têkoşîna demokrasî û azadiyê dest pê kir, bê dudilî tevlî bû. Her tim wek pêşengekî tevlî şoreşê dibû. Kedkariya wî li pêş bû. Demekê di nav artêşa azad de,  cih girt. Leşkerên ku ji rêjîmê veqetiyabûn Ev artêş, dabûn avakirin. Lê di demeke kurt de,  vê artêşê, taybetmendiyên xwe yên azadî û demokrasiyê winda kir, ket bin bandora dewletên dagirker.

Fêsel Ebû Leyla, ev rewş nepejirand û ji artêşa azad qut bû. Di nav Cephetul Ekrad (Eniya Kurd) de,  cih girt. Bi  kar  biryar û çalakiyên xwe di demeke kurt de,  bû fermandar. Bi navê roka bakur (Şems Şemal) tevgerek ava kir û bû fermandarê wê yê giştî.

Dema Daiş êrîşî Kobanê kir, bi hêzên xwe ve hat Kobanê û tevlî berxwedana Kobanê bû. Di berxwedana Kobanê de,  heft  caran birîndar bû, lê dîsa dev ji berxwedanê berneda, ji eniya şer dûr neket, li gel şervanên xwe ma. Fermandariyeke bê hempa da meşandin. Di

hevdîtinekê de, li ser berxwedaniya Kobanê wisa got: **"Kobanê wê nekeve. Trajediyên Şingalê wê li vir dubare nebin. Kobanê wê bibe gora Daişiyan"** Di encama berxwedaneke bê hempe de, Kobanê ji bin dagirkeriya Daişê hate rizgarkirin û pêşketina Daişê sekinî. Ebû Leyla, di vê berxwedanê de, wekî zinarekî bû.

Piştî Kobanê, hin deverên din ê Kurd û Ereban ji bin dagirkeriya Daişê hatin derxistin. Lê bajarê Minbicê di bin dagirkeriya Daişê de bû. Ebû Leyla ev tişt qebûl nekir, ji bo di demeke kurt de, Minbic rizgar bibe di nav tevgerê de bû. Di 2'ê cotana 2016'an de Encûmena Leşkerî ya Minbicê ava kir û bû berdevkê wê û amadekariya şerê rizgariya Minbicê kir. Ev ji bo rizgarkirina Minbicê bû gaveke dîrokî.

Di pêngava azadkirina Minbicê de, di demeke kurt de, gundên derdora Minbicê ji destê Daişê hatin rizgarkirin. Di 3'ê Pûşbera 2016'an de, di rizgarkirina gundê Xafiet Ebû Qelqele de birindar bû. Bi lezgînî Ebû Leyla veguhestin Silêmaniyê. Di 6'ê Pûşpera 2016'an de, di nexweşxaneya silêmanê de , jiyana xwe ji dest da û şehîd bû. Li Kobanê bi merasîmeke biheybet hat veşartin.

## Ş. Tamir Cemîl Behdî (Asro)

Cih û dîroka jidayîkbûnê: Gundê Tiltewîl Merşo, girêdayî bajarê Hesekê ye, di sala 1973'an de, ji dayîk bû ye.

Navê Bav: Cemîl Ilyas Behdî

Navê Dê: Munîra Ilyas Hena

Cih û dîroka şehadetê: Tilhurmiz – 2015




Malbata wî ji çar bira û pênc xwîşkan pêk tê, ji pêkhateya Suryan e; xwediyê baweriyeke xurt bi jiyaneke hevbeş bi hemû pêkhateyên din re bû. Ev şehîdê leheng xwedî sincekî pir bilind bû ji dê, bav, malbat, heval û hogirê xwe pir hez dikir. Zor û zehmetiyên jiyanê ew neçar kiribû ku dev ji xwendina dibistanê berdabû û berê xwe da kar û xebatê, da ku bikare alîkariya dê û bavê xwe bike.

Ji zarokatiya xwe ve, xewna wî ew bû ku berevaniyê di ber xak û gelê xwe de bike, mînaka wî ya jiyanê kesayeta Butrus Axa bû, lewma wî koçberî wek hin hevalên xwe nepejirand û bi xaka welatê xwe ve girêdayî ma.

Ji ber ku bi bîr û bawerî bû, lewra bi kêşeya gelên xwe yê (Suryan, Kuldo û Aşûr) ve girêdayî bû. Ew ji kesên yekem bû ku tevlî refên berevaniya di ber xak û rûmeta xwe de bû ji ber ku pir bi axa xwe ve girêdayî bû, hevalên wî navê Asro lê kirin, bi zimanê Suryanî tê wateya xak.

Bersiva bangewaziya erka xweparastinê da û bi hevalên xwe yên weke : Colyan, Cûzêf , Mîlad, Senherîb û Nînos re li Telhurmizê ji bo rûberkirina hêzên tarî yên dirinde li ber xwe da û rewanê xwe yê pak ji xaka xwe ya pîroz re kir qurban.

# Ş. BASIL

Cih û dîroka jidayîkbûnê: Hesekê 1994
Ş.Basil ji pêkhateya ereb e.
Ew sêyemînê heşt bira ye. Xwîşkeke wî heye.



Şehîd li Hesekê, li taxa Salihiyê mezin bûye, piraniya niştecihên wê kurd in, pêkhateya ereb jî li taxê dijîn, bê cudahî, bi aramî û dilşadî, hezkirin û wekhevî, bi hev re dijîn.Van têkiliyên erênî li ser şehîd Basil bandor kir.

Şehîd Basil heta refa 6'an li dibistana taxa Salihiyê xwendiye, êdî derbasî dibistana jiyanê dibe û ji bo pêdiviyên malbatê hevkariyê dike.
Wî ji her kesî hez dikir, lewra ew diket dilê her kesî , xwedî sincekî pir bilind bû, bi hemû kesên derdora xwe re fedekar û dilsoz bû. Rêzgirtin ji kesên temen mezin re digirt, dilovan bû û hezkiriyê civak û axa welatê xwe bû, lewra wî pir ji YPG' ê hez kiribû û di 1.2.2014'an de, tevlî refên YPG' ê bû. Bi dilsoziyeke bilind perwerde û xebata xwe di nav de kiribû. Piraniya hevalên wî kurd bûn. Piştî tevlîbûna wî ji YPG' ê re pir bi pêş ve çû û têgihiştina wî ya ramanî bilind bû. Wî tim ji birayên xwe re qala Rêvebirya Xweseriya Demokratîk a Rojava dikir. Wisa bûbû mînak ji birayên xwe re ku di bin bandora wî de şeş ji wan tevlî refên YPG' ê bûn. Ew li Hesekê/Mişêrfê di teqîna navenda YPG'ê ya di 6.10.2014'an de şehîd bû.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1-** Li ser şehîdekî/ê lêkolîn bikin û derbarê wî/ê de, nivîsekê binivîsînin?

**2-** Di bajarê we de, goristana şehîdan heye? Heger hebe bi heval û mamosteyên xwe re serdan bikin û hestên xwe binivîsînin.

# BEŞA 2

1-Çawa dijîn?
2-Çandinî -1
3-Çandinî -2
4-Lawirvanî
5-Daristan
6-Pîşesazî
7-Têkiliyên aborî û pîşeyan

WANE 1

# ÇAWA DIJÎN


## ABORIYA ME

Ji bo ku mirov jiyana xwe berdewam bikin, pêdiviyên wan bi xwarin, vexwarinê, cil û bergan hene . Pêwîst e wan pêdiviyên xwe bi cih bînin. Mirovan debara xwe bi komkirina giya û mêweyan kirine. Nêçîra lawirên ku di xwezayê de hene, kirine . Ji bo ku xwe ji sermayê bipararêzin eyarê lawirên ku nêçîr dikirin ji xwe re kirine cil û berg. Bi guherîna demsalan û nebaşbûna avhewayê kêmbûna giya, mêwe û lawiran, têra pêdiviyên mirovan nedikirin.

Pêdivî û pêşketina hizir, ji bo jiyanê rêbazeke nû afirandine. Ev rêbaz ji hilberînê bû. Giyayê ku kom dikirin, mêweyên ku dixwarin, tovên wan diçandin. Lawirên ku nêçîr dikirin, êdî ne dikuştin ew digirtin û kedî dikirin. Bi vê rêbazî pêdiviyên xwe pêk dianîn.



Derfetên derdora xwe bikaranîn û berhemên nû çêkirin, jê re **hilberîn** tê gotin. Çandina genim, çêkirina hewş, çêkirina caw an jî ji caw cil û berg çêkirin, mînakên hilberînê ne.



Mirovek, an jî herêmek, nikare hemû pêdiviyên xwe bi xwe pêk bîne, an jî hilberîna wê çêke. Ji ber vê yekê em hin pêdiviyên xwe ji cihê din distînin. Ji bikaranîna berhemên ku hatine hilberîn re, **mezaxtin** tê gotin. Di navbera hilberîn û mezaxtinê de girêdanek heye.

Taybetmendiyên avhewa, awayê rûerdê, çavkaniyên avê, belavbûna şêniyan an ku dewlemendiya sererd û binerdê li ser hilberîn û mezaxtinê bandoreke mezin dike.

**WANE 2**

# ÇANDINÎ -1

Ji bikaranîn û sûdgirtina ji axê re **çandinî** tê gotin. Çotkirin, tovavêtin, avdan, gubre û dermankirin hemû amûrên çandiniyê ne. Cihên ku avhewa guncav be, rûerda wî ne zêd e nişîv be, çavkaniyên avê hebin li wir çandinî tê kirin. Axa herêmên me ji bo çandiniyê baş e, rûerda wê jî ne pir nişîv e. Lê çavkaniyên avê kêm in, ji ber vê yekê li her cihî çandiniyên cuda tên çandin.

Berhemên çandiniyê li her derê wek hev çênabin. Çêbûna berheman li gorî germê tê guhertin. Mînak genimên li Dêrazorê û Reqayê ji ber rewşa hewayê ji yên Cizîrê zûtir çêdibin.

Ji kesên ku karê çandiniyê dikin, jiyana xwe li ser çandiniyê debar dikin re **cotkar** tê gotin.

Di Bakur û Rojavayê Sûriyeyê de, hin cih biyaban in (sehra-çol). Li van cihan ax ji bo çandiniyê ne baş e, şorbûna axê û kêmbûna ava çandiniyê bandoreke neyînî dike. Her çi qas gubre û bandora heyberên kîmyayî kêm be jî lê dîsa jî bandorek e.

Herêmên me salê di navbera 250-350mm de baranê distînin. Ango ne herêmeke avî ye ne jî herêmeke zuha ye. Ji ber vê yekê , berhemên havînê, genim û ceh zêd e tên çandin.

Herêma Efrînê ku bandora avhewaya deriya spî lê dike, havînê germ û zuha ye û zivistanê bi baran e û ne zêd e sar e. Ji ber vê hilberînên zeytûn, pirteqal, lîmon, hinar, tirî û arjeng lê tên çandin.

Di herêma Firatê de, avhewayeke zuha heye. Havînê zuha û germ e, zivistanê jî sar e û barana wê kêm e. Ji ber vê berhemên ku li hember bêaviyê li ber xwe bidin, tên çandin. Wek ceh, nîsk û fisteq helebî. Li derdora çemê Firat û Minbicê, çandinî baştir e. Cureyên çandiniyê dewlementir in.



Li herêma Cizîrê jî avhewayeke zuha heye. Zivistanê sar û kêm baran e. Lê dîsa

çandiniyeke zêd e tê çandin. Genim, nîsk, ceh, pîvaz û hwd. tên çandin. Li deştên Serê Kaniyê pembû jî tê çandin.

Herêmên Tebqayê û Reqayê li ber çemê Firatê ne, avhewaya wan di navbera avhewaya deriyaya spî û ya bejahiyê de ye. Zivistanê bi baran û sar e. Havînê zuha û germ e, genim, nîsk, ceh, zeytûn û fisteq helebî tên çandin.

Herêma Dêrazorê biyaban e, ji bo çandiniyê zêd e ne baş e. Çandinî hew li derdora çemê Firatê çêdibe.

**Em dikarin çandiniya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê em di sê beşan de parve bikin.**



- **Çandiniya dexil û dan:** Genim, ceh, garis û hwd. berhemên zeviyan tên çandin. Ev çandinî, hem avî û hem jî bejî çêdibe. Bi giranî dawiya payîzê tê çandin û di havînê de, tê komkirin.

- **Çandiniya ji bo êmê lawiran:** Ji bo xwedîkirina lawiran êm pêwîst e. Bi rengekî xwezayî çayirên ku hene, têra lawiran nakin. Ji ber vê çandiniya êm, an jî elfên lawiran cihekî girîng digire. Weke: Ceh, garis, nefel û hwd.



# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li herêma Firatê çi tên çandin?
2- Li ser çandiniya herêma xwe lêkolîn bikin?

**WANE 3**

# ÇANDINÎ -2

- **Çandiniya pîşesazî:** Çandiniyên pîşesazî, li kargehan, di hin qonaxan re tên derbaskirin û tên bikaranîn. Çandiniyên pîşesazî, ji bo hin beşên pîşesaziyê wek heyberên xam jî tê bikaranîn. Mînak levana şekir, ji bo şekir bê bidestxistin, tê çandin. Zeytûn hem tên xwarin û hem jî zeyt û sabûn jê tên çêkirin.Pembû, ji bo cil û berg û zeytê tê çandin.




Pembû, li Cizîrê bi pileyeke bilind dihat çandin. Lê di salên dawî de, kêmbûna avê û kêmbûna kargehên pembû, bandoreke neyînî li çandiniya pembo kiriye. Heger derfetên avdanê û kargehên wê hebin, erdên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, berhemeke pir baş didin.

Avhewaya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ji bo çandiniya levana şekir pir baş e. Salên ku baran kêm be, bi avdanê berhemên levana şekir zêde dibin. Ji levana şekir hem şekir û hem jî ji bo lawirên kedî tîmar tê bidestxistin. Li Cizîrê çandiniya levana şekir zêde bû, lê ji ber ku kargehên şekir li Cizîrê tune ne, ev çandinî pir kêm bûye.

Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, di nav avhewaya deriyaya Spî de dimîne. Ev avhewa zivistanê nerm û bi baran e û havînê zuha û germ e. Ev avhewa ji bo zeytûnan pir guncav e. Zeytûn hem avî û hem jî bejî çêdibe.

Zeytûn, cihekî girîng digire. Her sal, çandina darên zeytûnan zêdetir dibe. Zeytûnên Efrînê di dunyayê de, di nava pêşbirkê de ne. Li derdora Minbic û Kobanê jî hêdê hêdî çandiniya zeytûnan çêdibe.



Zeytûn hem ji bo xwarinê, hem ji bo zeytê û hem jî ji bo çêkirina amûrên paqijiyê tên bikaranîn.

- **Çandiniya Sebzeyan:** Pir cureyên sebzeyan hene:

- Sebzeyên giyayî: lehane (kelem) û spînax

- Sebzeyên bi dendik: baqil, fasûlî, nok, bazêla û nîsk

- Sebzeyên bi kok: pincar û gêzer

- Sebzeyên pîvazî: pîvaz, sîr, bacan, kundir û petata

Çandiniya van di her cihê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de, tê kirin. Di hin cihan de, wek sera sergirtî û li hin cihan jî di bexçeyan de, servekirî tên çandin.

- **Çandiniya fêkiyan:** Di avhewaya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de, bi dehan cureyên mêweyan tên çandin.
- Ev mêwe, piranî mêweyên daran in. Hinar, mişmiş, arjeng, tirî, hejîr, sêv û pirteqal li kantona Efrînê tên çandin.
- Sêv, tirî, fisteq helebî li derdora Kobanê tên çandin.
- Li derdora Minbic, Reqa û Tebqayê jî mêwe tên çandin.





# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Pembû di kîjan beşê pîşesazî de,  tê bikaranîn û çi sûd jê tên girtin?
2- Li herêma we çi sebze tên çandin ji bo agahiyan alîkariyê ji cotkaran bixwazin?

WANE 4

# LAWIRVANÎ

Lawirvanî, ji bo jiyana mirovan pir girîng e. Lawirvanî, xwedîkirina lawiran û ji berhemên wan sûd girtin e. Berhemên ku ji lawiran tên stendin weke: şîr, goşt, hêk û hwd in. Di debarkirina mirovan de jî cihekî girîng digire.

Lawirvanî, ji bo pîşesaziyê jî ji çavkaniyên berheman e. Bi taybet hirî û eyarê wan di çêkirina cil û bergan de, tên bikaranîn.

Li gel berhemên lawiran, mirov ji hêzên lawiran jî sûd digire. Bi taybet ji hêzên lawirên mezin sûd tê girtin. Dîsa di çûn û hatinê de, di barkişandin û cotkirinê de jî ji hêza lawiran sûd tê girtin.

Avhewa, awayê rûerdê, giyayên ku li herêmê çêdibin û taybetiyên erdnîgarî bandoreke mezin li lawirvaniyê dikin. Ji ber vê yekê li her herêmê lawirên cuda tên xwedîkirin.

Lawirvanî di nava xwe de, dibe sê beşên bingihîn û du beşên ku nû pêş dikevin.



- **Lawirên mezin:** Çêlek, ga, gamêş, Hêştir, hesp û hwd.
- **Lawirên biçûk:** Pez, bizin û hwd.
- **Lawirên firinde:** Mirîşk, elok, Ordek, şamî, qaz û hwd.

- **Lawirên avî:** Ew lawirên ku di nav avê de dijîn, tên xwedîkirin. Weke: masî û cureyên masiyan.

- **Mêşvanî:** xwedîkirina mêşan e. Bi taybet mêşên hingiv û mêşên hevrîşim.

Di herêmên me de jî, lawirên mezin, çêlek, ga, hêştir, hesp û gamêş tên xwedîkirin. Hem ji berhemên wan û hem jî ji hêza wan sûd tê girtin. Hin ji van di govan de û hin jî di çewlikan (mezraa) de, tên xwedîkirin. Lawirên mezin, cihê ku giyayê wê pir û avhewaya wê navîn be dijîn. Ev avhewa jî piranî li derdora herêma Efrînê guncav e. Lawirên mezin li Rojavayê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên xwedîkirin.

Di nav lawirên mezin de, hêstir cihekî girîng digire. Berê ji hêzên hêstiran sûd digirtin, di bazirganî an jî di çûn û hatinê de dihatin bikaranîn. Lê bi pêşketina tirmpêlan re, girîngiya hêstiran kêm bû. Hêstir di nav koçeran de, dihatin xwedîkirin. Rejîmê koçer niştecih kirin. Niştecihbûna koçeran girîngiya hêstirê kêm kir. Niha wek berê xwedîkirina hêstiran tune ye.

Lawirên biçûk, bi piranî mih û bizin tên xwedîkirin. Lê bizin ji ber ku zirarê didin daristanan kêm tên xwedîkirin. Erdnîgariya herêmên me ji bo xwedîkirinê destdayî ye. Lawir li her devera Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên xwedîkirin.

Lawirên firinde, li her deverê tên xwedîkirin. Bi piranî ji bo pêdiviyan tên xwedîkirin. Bi gelemperî kedîgehên mirîşkan bi pêş ketin.

Mêşvanî nû pêş dikeve. Bi taybet mêşvaniya hingiv û hevrîşmê. Ev cure hîn baş pêş neketiye.



Lawirvaniya avî, ji wê re **masîvanî** tê gotin. Di herêmên me de pir bi pêş neketiye. Ji ber ku deryayên welatê me tune ne. Lê dîsa di golan de, di çemên mezin de masivanî tê kirin. Êdî di hawizan de jî xwedîkirina masiyan pêş dikeve.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li herêma we çi lawir tên xwedîkirin?

2- Çima pêwîst e em ziyanê nedin lawiran û divê em çawa nêzî lawiran bibin?

**WANE 5**

# DARISTAN

Pêdiviyên mirovan bi berhemên daran hene. Berhemên wek kaxez û text ji daran tên bidestxistin. Ji ber vê yekê daristan jî di jiyana mirovan de cihekî girîng digirin. Tiştê herî diyarker di çêbûna daristanan de, baran an jî av e. Cihê ku baran kêm be, an jî av kêm be li wir daristan jî kêm in. Ji ber vê yekê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê daristan li her deverê tune ne.

Daristan piranî, li cihê ku tê de, çandinî çênabe pêş dikevin. Di van deveran de, an xwezayî an jî bi çandina daran daristan pêş dikevin. Piraniya daristanên herêmên me bi dest hatine çandin û sinober in. Daristan li çiyayên Kizwana, Qereçox û derdora Minbicê hene. Li kantona Efrînê daristanên bero hene û darên xwezayî çêdibin, li Çiyayê Hewar û çiyayê Gewr jî daristan hene.



**ÇIYAYÊ QEREÇOX**

Berê dar pir bûn, lê bi kêmbûna avê û çandiniya dexl û dan daristan kêm bûn.

Berhemên daristanan di pîşesaziyê de, wek heyberên xam tên bikaranîn û ji bo mirovan cihê kar in. Lê daristanên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, têra herêmê nakin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çima daristan kêm dibin?
2- Ji bo çi pêwîst e dar werin çandin?

**WANE 6**

# PÎŞESAZÎ

Rojavayê Kurdistanê di 1921'an de, bi peymana Enqerayê, ji Bakurê Kurdistanê hatiye cudakirin û ketiye bin serdestiya frensiyan. Di 1946'an de, dema Fransî ji vir çûn û dewleta Sûriyeyê ava bû, ket bin desthilatdariya Sûriyeyê.

Dewleta Sûriyeyê, ji xwe re yekîtiya sovyetê mînak girt û polîtîkayên wan ên aborî pêk anîn. Van polîtîkayan jî navendbûn û serdestiya mutleq a dewletê rewa dikir. Di her herêmê de, wekhevî û dadî pêk nedianî. Hin cih ji xwe re bingeh digirtin û hin cih pişt guh kirin.

Ji 1970'yî û şûndetir li ser hin çeman dest bi avakirina bendavan kir. Ev bendav bi du armancan bi kar anî. Armancek bidestxistina elektrîkê ye, armanca din jî ji bo avdaniyê ye. Bendava Tebqayê û bendava Tişrînê di encama van polîtîkayan de hatin çêkirin.

Hemû berhemên mezin, bi taybet petrol, av, elektrîk, kanza û çimento rasterast di destê dewletê de ne. Hin berhemên wek xwarin, cawkarî (tekstîl), derman her çi qasî taybet bin jî lê dibin kontrola dewletê de ne.



Petrol û av giranî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne. Lê ji bo bikaranîna wan tu parzûngeh ne hatine çêkirin. Petrolên ku ji Cizîrê û Dêrazorê derdikevin, bi xetên boriyan birine Tertûs û Banyasê, li wir parzûn kirine. parzûngeh li cihê ku petrol derdikeve çênekirine. Niha nû parzûngehên biçûk tên avakirin.

Dewleta Sûriyeyê tu kargehên xwarin, vexwarin, cil û berg û dermanan li vê herêmê çênekirine. Kargehên biçûk yên van berheman nû li vê herêmê bi pêş dikevin. Kargehên çementoyê dema fransiyan, li Kobanê hatine çêkirin. Ji bilî wê tu kargeh li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nehatine çêkirin.



Ji bo derxistin û bi karanîna kanzayan tu pêşketin li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nehatine kirin. Ev herêm ji aliyê petrol, gaz û kanzayan ve pir dewlemend e, lê hîn nehatiye bikaranîn.

## BAZIRGANÎ

Berhemên xwezayî li her dera rûyê erdê ne wek hev in. Di hin cihan de hin berhem pir in, di hin cihan de kêm in. Ji ber wê pêdiviya herêman bi hev heye, heta ku berhemên xwe bi hev biguherînin. Hilberînên ku di herêmekê de tên çêkirin, ji pêdiviyan bêtir be, ev berhem ji herêmeke cuda re, an jî ji dewleteke cuda re tên şandin. Pêdiviya herêmekê bi çi hebe, wan distîne. Ji vî karî re bazirganî tê gotin.

Bazirganiyeke mezin li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tune ye. Bazirganiya herî sereke petrol, gaz û genim e. Ev berhem di nav herêmê de tên mezaxtin. Hesin, çemento, şekir û berhemên wek wan ji derve tên stendin.

## PEYWENDÎ

Bi pêşketina teknolojiyê re, di herêmên me de jî peywendî bi alavên pêşketî çêdibin. Telefon, internet di herêmên me tên bikaranîn. Dîsa têkiliyên di navbera civakê de, wek rojname û kovar; nivîskî, wek radyo; bi deng û wek televizyon û internet hem deng, hem jî bi dîtinî tên bikaranîn. Bi rêya van amûran, tiştên ku li herêm, an jî dewletên cuda rûdidin zû dibihîzin.

Di herêmên me de bi navê Ronahî, Rojava, Minbic, Qamişlo 4 kanalên televizyonê hene. Bi dehan radyo, rojname û kovar weşana xwe dikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çima kargeh li herêmên me kêm in?
2- Li ser bazirganiyê biaxivin?

WANE 7

# TÊKILIYÊN ABORÎ Û PÎŞEYAN

Ji bo ku mirov pêdiviyên xwe pêk bîne, pêwîst e kar bike. Ji karên ku mirov her dem dike re **pîşe** tê gotin. Şert û mercên cihên ku em tê de, dijîn, çalakiyên aboriyê yê vê herêmê bandorê li hilbijartina pîşeyên me dikin. Di herêmekê de, çi çalakiyên aborî hebin, çi hilberînên aborî hebin, li gorî van çalakiyan pêdivî bi mirovan heye. Pêdî bi kesên ku van karan bike heye. Mînak li Efrînê zeytûn hene. Pêdivî bi kesên ku karê zeytûnan bikin heye. Li Cizîrê ceh û genim tên çandin, pêdivî bi kesên ku van karan bikin heye. Ji ber vê yekê di herêmekê de, çalakiyên aborî bandorê li pîşeyan dikin.

## PÎŞEYÊN KU BI ÇANDINÎ Û LAWIRVANIYÊ VE GIRÊDAYÎ PÊŞ DIKEVIN:

Di gund û navçeyê de, şêniyên ku dijîn jiyana xwe li ser çandinî û lawirvaniyê derbas dikin. Çandinî piranî di deştan û cihê guncav de pêş dikeve. Li vir pîşeyên bijîşkî û endezyariya çandiniyê li pêş in. Cihê ku lawirvanî li pêş e jî bijîşkiya lawiran, goştfiroşî, şivantî, masîvanî, mêşvanî bi pêş dikevin.



**Endezyariya çandiniyê:** Bi gotineke din, bijîşkiya çandiniyê. Nexweşiyên şînatiyan baş dike, berhemên çandiniyê bi rê û rêbazên cuda pir dike. Cotkaran li ser pirkirina berheman, nexweşiya çandiniyan û çandiniya ekolojîk perwerde dike.



**Bijîşkiya lawiran:** Lawirên nexweş an jî birîndar sax dike. Ji bo nexweşî belav nebe tedbîran distîne û lawiran derman dike.

## PÎŞEYÊN KU BI DARISTANVANIYÊ RE PÊŞ DIKEVIN:

Cihê ku bi şilî be û baranên wê pir bin, daristan lê hene, Berhemên daristanê di çêkirina kaxez, text tê bikaranîn. Zivistanan di germkirina malan de, tê bikaranîn. Darvanî, dartiraş, endeziyarên daristanê, karmendên daristanê û hwd. Pîşe pêş dikevin.



**Endezyariya daristanan:** Cihên daristanan dibînin, di van cihan de, çandiniya daran bi pêş dixin û parastina wan daran dikin.

## PÎŞEYÊN KU GIRÊDAYÎ PÎŞESAZÎ Û BAZIRGANIYÊ PÊŞ DIKEVIN:

Hejmareke mirovan di kargehan de, kar dikin. Di van herêman de, pîşeyên cawkarî (dirûtina cil û bergan), mekanîka erebeyan, torno, kîmya û hwd pêş dikevin. Dîsa berhemên ku hatine hilberîn digihêjin cihên pêwîst. Ên ku bi vî karî radibin bazirgan in. Ango di van cihan de, pîşeya bazirganiyê û beşên têkildarî wê pêş dikevin.

## XELEKÊN HILBERÎN Û MEZAXTINÊ

Em diçin ji firoşgehê, tûrikek savar, makaron, ava bacanan an jî mast distînin.

**Em qet hizrîne ev çawa hatine çêkirin û di kîjan qonaxan re derbas bûne heya gihîştine me?**

Me li jor gotibû ku li her deverê her berhem çênabe. Erdnîgarî, avhewa li ser vê bandor dike. Di hin cihan de, çandinî di hin cihan de, lawirvanî, di hin cihan de pîşesazî li pêş e. Di encama van çalakiyan de, berhemên nû çêdibin. Em ji van berheman re dibêjin **mal**.

Ji çalakiyeke aborî, berhemeke nû bidestxistinê re **hilberîn** tê gotin. Weke: ji pembo an jî ji hiriyê cil û berg çêkirin, ji daran mobîlya çêkirin, ji zeytûnê zeyt çêkirin.



Berhemên ku ji hêla karkeran ve tên çêkirin, ji bo ku bigihêjin cihên pêwîst tên belavkirin. Ango di aboriyê de, gava yekemîn hilberîn e, gava duyemîn belavkirin e. Mînak: bacanên sor ku di zeviyan de, tên hilberîn li bazar an jî firoşgehan tên belavkirin. Piskewîteke ku li kargehan çêdibe, li firoşgehan tê belavkirin.

Berhemên ku li bazaran an jî firoşgehan tên belavkirin, kesên ku pêdiviyên wan pê heye diçe distîne û dimezêxe, ji vê re jî **mezaxtin** tê gotin. Mînak: em diçin ji firoşgehê mast distînin û dimezêxin, an jî ji firoşgehekê ji xwe re cilan distînin û bi kar tînin.

Ango çalakiyên aborî, ji xelekên hilberîn, belavkirin û mezaxtinê pêk tên û ev qonax hev temam dikin.

Mînak : Cotkar, payîzê genimê xwe diçînin, buharê av didin, gubre dikin da ku baştir çêbe. Havînê dema genim çêbû, derase genim kom dikin. Ev genim diçe mîrayan.



Ji wir jî diçe aşan, an jî diçe kargehan. Di aşan de dibe ard di kargehan de, dibe berhemên cuda. Ev berhem, bi rêya bazirganan li her derê tên belavkirin. An jî diçe pêjgehê û nan çêdibe, an jî ji firoşgehan berhemên cuda distînin. xelek wisa temam dibe, hilberîn-belavkirin-mezaxtin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li gorî xelekan tabloya li jêr dagirin.

| **Berhemên mezaxtinê ên bingihîn** | **Hilberîn** | **belavkirin** | **mezaxtin** |
|---|---|---|---|
| **Zeyta Zeytûnan** | Cotkar, zeytunên xwe kom dike dibe kargehê dixe zeyt û dixe şûşan. | Bazirgan bi tirmbêlan zeytê li ser firoşgehan belav dike | Em jî ji firoşgehê distînin û bi kar tînin |
| **Şîr** | | | |
| **Cil û berg** | | | |
| **Kaxez** | | | |

2- Li cihê ku hûn lê dijîn, çi karên aborî tên kirin?

3- Di herêmên we de, bi van karên aboriyê ve girêdayî çi pîşesazî pêşketine?

4- Aboriyên derdora we, çawa bandorê li ser jiyana civakê dikin?

5- Li gorî we di navbera hilberîn û mezaxtinê de çi girêdan heye?

6- Ji bo hilberîn bi pêş bikeve, li gorî we pêwîst e çi bê kirin, bi heval û mamosteyên xwe re gotûbêj bike?

# BEŞA 3

1- Cihê ku em lê dijîn
2- Avhewa û bandorên wê li ser jiyanê
3- Şênî û bicihbûn
4- Bobelatên xwezayî

**WANE** 1

# CIHÊ KU EM LÊ DIJÎN

## RÛERD

Nizmbûn û bilindbûnên li ser rûerdê mîna: newal,deşt, zozan, gir û çiya, rûerdên ku nêzîkî me ne û em bi çavên xwe dibînin. Lê rûerdên ku ji me dûr in, em bi çavên xwe nikarin bibînin, em wan bi alîkariya nexşeyan dibînin. Li gorî hin pîvanan ji biçûkirin û xêzkirina rûerdê re **nexşe** tê gotin. Ji bo xêzkirin bibe nexşe, hin pîvanên wê hene. Pêwîst e li gorî wan pîvanan be; ew pîvan jî ev in:

a- Di dema xêzkirinê de, pêwîst e ji jor ve lê bê mêzekirin.
b- Nexşe li ser cihekî rast bê xêzkirin.
c- Tiştên ku tên xêzkirin, li gorî hin pîvanan bin.


Dema tiştek tê xêzkirin û nexşe tê çêkirin ji pîvanên biçûkirina wê re **pîvang** tê gotin. Ev pîvang, li gorî pîvanên rast tê biçûkirin. Dema nexşe hat çêkirin, tê boyaxkirin û di rojhilatê başûrê nexşeyê de, wateya nîşanên ku di nexşeyê de hatine bikaranîn tê nivîsîn.

Li gorî bilindahiyê rengên nexşeyê tên guhertin. Ji nexşeyên ku li gorî rengan hatine çêkirin re, nexşeya **fîzîkî** tê gotin. Em bi alîkariya rengên ku di nexşeyê de, hatine bikaranîn, dikarin bilindahiya cih û herêmên xwe fêr bibin. Weke pîvaneke erdnîgariya gerdûnî, bilindahiya asta deryayê sifir (0) tê pejirandin. Pîvana bilindahî an kûrbûnê li gorî vê tê çêkirin.

### - Li gorî rengan kûrbûn an jî bilindbûn

**Şîn:** Di nexşeyê de şîn, asta deryayê dide nîşandan. Dema şînekî tarî be, tê wateya kûrbûna zêde. Heger şînekî vekirî be, tê wateya kûrahiya kêm.

**Kesk:** Bilindahiya nêzîkî deriyayê dide nîşandan. Di nexşeyê de, cihê ku bi kesk hatine nîşankirin 0-500m bilindahiya wan heye.



**Zer:** Bilindahiyên ku di navbera 500-1000m de, dide nîşandan.

**Pirteqalî:** Bilindahiyên di navbera 1000-1500m de dide nîşandan. Ew cih bi piranî zozan in.

**Qehweyî:** Rengê qehweyî çiyayan dide nîşandan. Bi taybet ji cihê ku bilindahiya wê di ser 1500m re be.

**- Di nexşeya fîzîkî de rûerd:**

Me got ku nexşeya fîzîkî bi rengan kûrbûn, an jî bilindbûnê diyar dike. Ji bilî bilindbûn û kûrbûnê, rûerda din jî nîşan dide.

**- Çiya:** Ji cihên ku li gorî derdora xwe bilind in û cihekî mezin digrin re **çiya** tê gotin. Hin çiya bi serê xwe ne û hin çiya rêzeçiya ne. Li gorî çêbûna wan navên cuda digrin. Weke: Çiyayê Kezwanan, Qereçox, Çiyayê Hawar û Çiyayê Lêlûnê.

**- Çem:** Ji avên ku diherikin re **çem** tê gotin. Mezinbûn û firehbûna wan tê guhertin. Hin ji wan herdemî ne û hin ji wan demsalî ne. Weke: ava Firat, Dicle, Xabûr û Çeqçeq.

**- Deşt:** Cihên ku li gorî derdora xwe nizm in ji wan re **deşt** tê gotin. Piranî deşt rast in û ji bo çandiniyê tên bikaranîn. Weke: deştên Cizîrê, deştên Hemkê (Efrîn) û deştên Dêrazorê.

**- Newal:** Qelişteke mezin e ku bi herikîna avê re çêbûye. Weke: Gêliyên Berbenê (Efrîn).

**- Zozan:** Rastgehên ku li gorî derdora xwe di bilindahiyê de dimînin. Ev rastgeh, ji hêla avên ku diherikin ve hatine çêkirin weke: zozanên çiyayê Kezwanan.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li ser nexşeya fîzîkî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, herêma xwe bibînin û bilindahiya wê bipîvin.
2- Di herêmên we de çi rûerd hene, li ser nexşeya ku hûn çêkin, nîşan bikin?

**WANE** 2


## AVHEWA Û BANDORÊN WÊ LI JIYANÊ

Di nav atmosferên ku erd pêçane de hin bûyerên hewayê çêdibin, weke: ba, baran, mij, zîpik, berif û hwd. Ji wan re **rewşa hewayê** tê gotin. Ev bûyer, li ser jiyanê bi bandor in. Ji ber wê fêmkirina rewşa hewayê her dem bala mirov kişandiye û mirovan ew lêkolîn kiriye, xwestiye fêm bike û li gorî wê li hember bandorên wê yên nebaş bergiriyên pêwîst bistîne. Mirovan li gorî vê rewşa hewayê çandinî kirine û lawir xwedî kirine.

Ji wan bûyerên giştî re **avhewa** tê gotin. Texmînkirin û şopandina avhewayê wek zanistekê pêş dikeve. Bi taybet vê mijarê bi pêşketina teknolojiyê re gavên mezin avêtine. Ji zanistên avhewayê re avhewanasî **(climatoligy-klimatolojî**) tê gotin.

**Di Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de 2 cureyên avhewayê tên dîtin:**

a- Avhewaya deryaya spî: Ev avhewa havînê germ û zuha ye, zivistanê bi baran e, lê sermaya wê ne dijwar e. Ji Efrînê heya Minbicê di bin bandora vê avhewayê de ye. Şînatiya wê pir e. Darên mêwe û daristanên wê hene.



b- Avhewaya bejahî: Ev avhewa, havînê germ û zuha ye, zivistanê sar e û bi baran e. Daristan û şînatiya wê kêm e. Ji çemê Firatê heya çemê Dicleyê wisa ye. Di nav xwe de cuda dibe, avhewaya Cizîrê û avhewaya Dêrazorê ji hev cuda ne. Avhewaya Cizîrê hênik e û nermtir e, lê avhewaya Dêrazorê biyabanî ye.

Avhewa, bandorê li çûn û hatin, cil û berg, lawirvanî, çandinî, xwarin û vexwarin û çêkirina hewşan dike.

Mînak:

Li Dêrazorê, germahî û toza ku çêdibe, bandorê li cil û bergan û çêkirina hewşan dike. Li Efrînê zeytûn pir in, xwarina wan a sereke xwarinên ku bi zeyta zeytûnan tên çêkirin in.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Avhewaya derdora we çawa ye û li ser jiyanê çawa bandor dike?
2- Avhewaya derdora we ji bo çi berheman guncav e, lêkolîn bikin?
3- Li gorî we avhewa çi bandorê li çêkirina hewşan dike?

**WANE 3**

# ŞÊNÎ Û BICIHBÛN

Ji mirovên ku di cihekî diyar de dijîn re **şênî an jî nifûs** tê gotin. Mînak: Şêniyên herêma Reqayê, şêniyên bajarê Qamişloyê, şêniyên navçeya Tilhemîsê, şêniyên gundê Berxbotanê. Şênî, ji bo jiyan û aboriya xwe berdewam bikin pêwîst e di cihekî de, bi cih bibin ji wê re jî **niştecihbûn** tê gotin. Şênî dema cihê niştecihbûnê diyar dikin, avhewaya wê û derfetên kar li ber çavan digrin. Ev pîvan bi temamî di jiyana mirovan de derbasdar in.

Şênî li hin cihan pir in û li hin cihan jî kêm in. Sedemên ku bandorê li belavbûna şêniyan dikin ev in:

- **Sedemên xwezayî**
- **Sedemên mirovî**

**Sedemên xwezayî:** Di niştecihbûnê de, sedemên xwezayî bandoreke mezin li şêniyan dikin. Em dikarin van bandorên xwezayî wisa bi lêv bikin: avhewa, cureyên axê, rûerd, çavkaniyên avê, çavkaniyên şînatî û çavkaniyên lawirvaniyê.

**Sedemên mirovî:** Di niştecihbûnê de, sedemên mirovî jî bandoreke mezin dikin. Mirov sedemên mirovî bi xwe çêdike. Bi vê bandorê, sedemên xwezayî kêm dike. Em dikarin wan jî wisa bi lêv bikin: çûn û hatin, pîşesazî, bazirganî, çandinî û lawirvanî.

Em dibînin ku lawirvanî û çandinî, hem di nav sedemên xwezayî de û hem jî di sedemên mirovî de cih digrin. Ev girîngiya wan di jiyana mirovan de dide nîşandan.

## SEDEMÊN XWEZAYÎ:

**- Avhewa:** Di niştecihbûnê de, avhewa bandoreke mezin dike. Li cihê gelekî sar, an jî cihê gelekî germ nayê jiyîn. Li cihê ku avhewaya biyabanî bi bandor e li wir niştecihbûn bi pêş neketiye.

**- Rûerd:** Şênî bi piranî li deşt û zozanan ji bo niştecihbûnê cih digirin. Li vir hem jiyan hêsantir e, hem jî derfetên kar pir in. Her çi

qasî ji kurdan re netewên çiyayî bê gotin jî, di zozanên di navbera çiyayan de, jiyane.

**- Çavkaniyên avê:** Av ji bo berdewamkirina jiyanê tiştekî bingeh e. Bê av jiyan nabe. Ji ber vê ji despêkê heya roja me, mirov li derdora avan, bi cih bûne an jî li avê geriyane. Cihê ku av hebe, çandinî, lawirvanî çêdibe. Jiyan hêsantir dibe. Em li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî dibînin ku, jiyan li derdora avan heye. Bi taybet jî derdora çemê Dicle û Firat ê.

**- Xaka berhemdar:** Her cureyê axê, ji bo çandiniyê ne baş e. Niştecihbûn li derdora axa ku ji bo çandiniyê baş e çêbûye. Di biyabanan de jiyan ji ber axê pêş neketiye.

**- Çandinî û lawirvanî:** Mirovahiyê li ku derfetên çandinî û lawirvaniyê dîtiye li wir bi cih bûye. Hin cih ji bo çandinî û lawirvaniyê dewlemend in û hin herêm jî lawaz in. Herêmên me di vê mijarê de, dewlemend in. Ji ber vê yekê dîroknas ji bo herêmên me dibêjin hîlala bi bereket - kevana zêrîn.

## SEDEMÊN PÎŞESAZÎ:

**Çandinî û lawirvanî:** Cihên ku avhewaya wê guncav be li wir bi destên mirovan çandinî û lavirwanî hatine pêşxistin. Deşt û zozan ji bo vê derfet didin. Ji ber vê yekê di van cihan de, şênî pir in.

**Bazirganî:** Kesên ku berheman çêdikin, dixwazin berhemên xwe yên zêde bifroşin, an jî dixwazin tiştê ku pêdiviya wan pê heye, bistînin, ev bazirganiyê pêş dixe. Cihê ku bazirganî pêş ketiye, şênî pir in. Cihê ku bazirganî lawaz be, şênî jî kêm in. Bazar, her tim mirovan dikişîne nava xwe.

**Pîşesazî:** Kargeh ji bo bikarin hilbirînê bikin pêdiviya wan bi mirovan hene, ev rewş mirovan dikişîne cihê ku kargeh lê hebe. Kesên ku di wan kargehan de kar dikin, kesên ku berhemên wan kargehan belav dikin, kesên ku van berheman difroşin hejmareke berfireh e. Dîsa pîşesazî, derfetên kar diafirîne. Her çi qas sedemên cuda hebin jî ji ber vê ji gundan koçberî bajaran dibin.

**Çûn û hatin:** Çûn û hatin, an jî rê li ser jiyana mirovan bandoreke mezin dike. Ji ber vê niştecihbûn li derdora rêyan an jî nêzîkî rêyan çêdibe. Cihên ku çûn û hatina wan neasayî û asê be, niştecihbûn lê

lawaz e û şêniyên wê kêm in. Rê an jî cûn û hatin di niştecihbûnê de, cihekî bingeh digire.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de, şênî li ku derê pir in, li ser nexşeyê nîşan bikin?
2- Bandorên xwezayî û pîşesaziyê li ser niştecihbûnê lêkolîn bikin ?
3- Niştecihbûn li cihê ku tu lê dijî çawa ye, çi bandor li wê niştecihbûnê kiriye?

**WANE 4**

# BOBELATÊN XWEZAYÎ

Li ser rûyê erdê hin bûyer çêdibin ku li ser jiyana zindiyan metirsiyên mezin çêdikin. Em dikarin van bûyeran bixin du beşan. Beşek bûyerên xwezayî ne, di çêbûna wan de bandora mirovan ne pir e. Hin bûyer jî bi destê mirovan tên çêkirin. Taybetiyên bûyerên xwezayî ev in:

- Di çêbûna wan de, bandora zindiyan ne pir e.
- Daneseknandin, an jî pêşîlêgirtina wan bi piranî ne gengaz e.
- Dibin sedemên windahiyên giyanî û heyberî.
- Di demeke kurt de, pêk tên.

Lê di roja me de, li ser bûyerên xwezayî jî bandora mirovan çêbûye. Mînak: Teqandinên nukleriyê, rê ji erdhejan re vedike, an jî erdhejan zêde dike. Jêkirin, şewitandin û tunekirina daristanan, rê li ber aşût û herikandina axê vedike. Ji ber vê li ser bûyerên xwezayî jî bandora mirovan heye.

## Hin bûyerên xwezayî ev in:



**Erdhej:** Teqandina enerjiya ku dibin erdê de, kom bûye. Divê teqandinê de, pêlên hejandinê çêdibin. Ev pêlên hejandinê li gorî hêzên wan dibin sedemên windahiyên mezin. Berê di çêbûna erdhejan de, bandora mirovan tune bû. Lê roja me ya îro, bandora mirovan heye. Binerdê teqandina mezin yek ji sedemên erdhejê ye. Teqandina volkanan jî sedemên erdhejê ye. Bi kolana bîran, an jî derxistina kanzayên binerd valatî çêdibe, demeke şûndetir ev valatî noq dibe û erdhej çêdibe. Mirov nikarin erdhejê bidin seknandin.

Dibe ku windahiyên giyanî û madî yê herî mezin di erdhejan de çêdibin. Bi deh hezaran mirov jiyana xwe ji dest didin. Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne li ser xeta erdhejê ye. Ji ber wê li vir pir erdhej

çênabin. Lê Bakur û Rojhilatê Kurdistanê li ser xeta erdhejê ye. Bi dehan erdhejên mezin li vir çêbûne û bûne sedemên windahiyên mezin.

Heya niha sê xetên erdhejê hatine vedîtin. Ev vedîtin li gorî mezinbûn û cihê wan hatiye kirin.

**- Xetên 1:** Ji başûrê Amrîka ji Chili(Şîlî) dest pê dike, Amrîka, Meksîk, Japonya, Filipin, Zellanda û hin giravên derdora wê. Erdhejên mezin % 81 li van herêman çêbûne.

**- Xeta 2:** Ji Endonezya dest pê dike, li ser çiyayên Hîmalaya berdewam dike, ji wir xwe digihîne deriyaya Spî. Kurdistan jî li ser vê herêmê cih digire. Erdhejên mezin % 17 li van herêman çêbûne.

**- Xeta 3:** Okyanosiya Atlantîk û girava wê. % 2 erdhejên mezin li wir çêbûne.



**Lehî:** Bi helîna berfê, an jî bi barîna barana zêde re asta avê bilind dike. Bilindbûna avê, cihê ku jê derbas dibe ziyanê dide. Ji vê bilindbûnê re **lehî** tê gotin. Hin caran bandora wan lehiyan dibe sedema windahiyên razber û şênber



**Şewat:** Di herêmên me de, şewat pir çêdibe. Hin caran birûsk dibe sedema şewatê. Şewat bi giranî bi destê mirovan çêdibe wek venemirandina cixaran, camên şikestî ku hatine belavkirin. Şewat hem giyanî û hem jî heyberî ziyaneke pir mezin dide.

## BANDORA BOBELATÊN XWEZAYÎ LI SER JIYANA MIROVAN:

Bobelatên xwezayî li ser jiyana mirovan bandorên mezin dikin û şopên kûr dihêlin. Windahiyên giyanî û birîndar çêdibin. Avên paqij ku kêm dibin, nexweşiyên cuda cuda derdikevin. Daristan an jî şînkayî ziyanê dibînin, ev jiyana lawirên ku di daristanan de dijîn dixe xeteriyê. Dîsa şînatî ku kêm dibin, oksîjen û hewaya paqij, kêm dibin. Hewş û kargeh xira dibin, çandinî û lawir ziyanê dibînin, pêdiviyên mirovan nayên pêkanîn. Cotkar, an jî kedkar di bin deynan de dimînin.

Li gel windayihên heyberî, windahiyên giyanî jî çêdibin. Moralên mirovan jî xirab dibin.

## BANDORA MIROVAN LI SER JÎNGEHÊ

Ji bo ku em bijîn, ji çavkaniyên xwezayî sûdê digrin. Hewa, av, şînatî, lawir, kanza çavkanî û berhemên xwezayî ne. Ev çavkaniyên xwezayî tu carî bi dawî nabin. Lê bi karanîna şaş van çavkaniyan kêm dike.



Bi taybet, bi berjewendiyên xwe hizirîn rê ji wan re vedikin. Ji bo kargeh bên çêkirin, bi dehan hektarên çandiniyê tên xirakirin û dar tên jêkirin. Ji bo erdê daristanan ji xwe re vekin, şewitandina daristanan pir heye. Qirêjiyên ku mirov davêjin nav çem û golan jiyana zindiyên cuda dixe metirsiyê. Dîsa ew av qirêj dibe, li ser tenduristiya mirovan bandor dike.

Bermahiyên hişk an ter ku berdidin nav axê, taybetiyên axê xira dikin. Bi xirabûna taybetiyên axê, berhemên axê jî kêm dibin. Kêmbûna berheman, zindiyên ku li ser wê axê dijîn, hêdî nikarin jiyana xwe berdewam bikin. Bi vî awayî şînatiyên rûyê erdê her ku diçe kêm dibin. Ji ber ku şînatî, gazên



karbondoîksîd distînin, bi tîrêjên rojê re dizivîrine oksîjen. Ji bo jiyana zindiyan oksîjen nebe nabe. Kêmbûna şînatiyan, kêmbûna oksîjenê ye, ew jî kêmbûna jiyanê ye.

Xweza bi xwe di nava hevsengiyekê de ye. Heger destlêwerdan çênebe ev hevsengî berdewam dike. Lê ji bo berjewendiyên xwe mirov destlêwerdana xwezayê dike. Ev destlêwerdan hevsengiya xwezayê xira dike. Ev jî dibe sedem ku zindiyên cuda nikarin jiyana xwe berdewam bikin û tune dibin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Wêneyên li jêr çi dibînin. Ev bûyer bêne serê we hûn çi hîs dikin. Hest û ramanên xwe binivîsînin, bi mamoste û hevalên xwe re gotûbêj  bikin.



2- Ji bo pêşîlêgirtina bûyeran, an jî kêmkirina bandora wan, pêwîst e, em çi bikin?

3- Bûyereke xwezayî hilbijêrin û bandora wê bi wêneyekê çêkin?

# BEŞA 3

1-Herikandina dîrokê ya dijber: Şaristanî

2-Şaristaniyên Mezopotamiyayê

3-Şaristaniyên Anadolê

4-Şaristaniyên din

## WANE 1

# HERIKANDINA DÎROKÊ YA DIJBER: ŞARISTANÎ

Bi çêbûna bajar, çîn û dewletê re dîrok bi rengekî din diherike. Van taybetiyan, neolîtîk an jî civaka xwezayî berevajî kiriye. Bi dîtina nivîs û bi pêşketina hin zanistan re ev rewş kûrtir dibe, ji vê re **şaristanî** tê gotin.


Bajarbûn, xwe li ser keda gundan dide jiyîn û wek dijberiya gundan pêş dikeve. Pîvanên civaka xwezayî xira dike. Di gundan de têkiliyên xizmtî û mirovantiyê hene. Ango têkiliyên xwînê derbasdar in. Lê bajar van têkiliyan xira dike, li cihê têkiliyên xizmtî, mirovantî û xwînîtiyê, têkiliyên berjewendiyan derdixe pêş. Bi vî awayî, bajar ji pêşketina civakbûnê qut dibe û dikeve dijberiyê. Heya niha di erdkolanan de, bajarên herî kevin ên ku hatine dîtin, bajarê Erîdo ye. Piştî wî bajarê Urûkê tê avakirin. Ji xwe destana Gilgamiş, avakirina bajarê Urûkê ye.

Bi bajarî re, di nava civaka wekhev de çîn çêdibin. Serdest û bindest çêdibin, ev dibe bingehê çînîtiyê. Ê ku vê di despêkê de, pêş dixin, rahib in. Rahib, hêza rewanî ya civakê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne. Baweriya civakê bi dest dixe. Ji bo civakê bide qanikirin, çîrokan çêdike. Her ku diçe di civakê de, tebeqe kûrtir dibin. Dîroknas dibêjin çînên destpêkê çînên rahiban in.

Bi avakirina bajar û çînîtiyê re rê ji desthilatdariyê re tê vekirin. Ev desthilatdarî dema dibe mayînde dizîvire dewletê. Dewlet xwe li ser birevêbirina civakê ferz dike; hêzên birêvebirinê dixe destên xwe. Ji ber vê dewlet pîroz tên dîtin. Di lêkolîna dîrokî de, ji nav dewletên ku derketine holê dewleta despêkê dewleta Sumeriyan e.

# ŞARISTANIYÊN MEZOPOTAMIYAYÊ

## SUMER




Di derbarê koka Sumeran de, agahiyên zelal tune ne, tişta tê zanîn ji pêşketinên şoreşa neolîtîkê û çanda Ariyan sûd girtine. Bi vê sûdgirtinê li Mezopotamyaya Jêrîn, bakurê kendavê derdora tevlîbûna çemên Dîcle û Firatê şaristaniya xwe ava kiriye. Di navbera 4000-2500 sal B.Z de, bajarên weke (Ûr, Urûk, Kîş, Lagaş, Nîpur...) ava kirine û tê de, desthilatdariya xwe meşandine. Di dîrokê de, wek dewletên bajaran tên nasîn. Ji aliyên rahiban ve hatine birêvebirin û ji wan re **Patesî** tê gotin. Olên wan pir xwedayî ne. Jin di dema sûmeran de, hat şikandin.



Ji bo perestinê bi navê ziguratan cih çêkirine. Lê ev zigurat tenê wek cihê persetinê nehatine bikaranîn. Di destpêkê de, wek depo û piştre jî wek dibistan hatin bikaranîn. Sumeran, nivîsên mîxî dîtine û bi kar anîne. Bîrkarî û endezyarî pêş xistine. Salnameyên heyvê bi kar anîne. Zanistên astronomî (zanista felek) pêş xistine.

Em dikarin vedîtinên sumeriyan wisa bi lêv bikin:



- Bîrdoziya çînan û saziya dewletê ava kirine.
- Zagon û hiqûqên nivîskî derxistine.
- Bazirganî û sanatkarî pêş xistine.
- Perestgeh (Zîgurat) ava kirine.
- Milkiyeta taybet û malbata baviksalarî û xanedanî ava kirine.
- Wêjeya nivîskî, efsane û destan derxistine, yekemîn destaneya dîrokî ya nivîskî Gilgamêş e. Ew jî di dema Sumeran de, hatiye nivîsîn.

Sumeran, hemû berhemên mirovahiyê yên heya wê demê hatine dîtin ji xwe re bi kar anîne û xistine bin xizmeta xwe. Bi vî awayî di hizir, raman, ol, bîr û baweriya mirovan de, guhertin çêkirine, hişmendiya dewlet û desthilatdariyê di nava civakê de, belav kirine.

Sumeran bi hezarên salan berdewam kirine. Piştî 2500 B.Z di encama êrîşên qebîleyên hûrî û akadan de, lewaz bûne û ji salên 2300 B.Z û şûn ve, li cihê Sumeran bi pêşengtiya qiral Sargon imperatoriya Akad tê avakirin.

## AKAD:



Êlên Semîtîk in, B.Z di salên 2350'an de, bi pêşengiya qiral Sargon êrîşî Sumeran dikin. Bi destxistina bajarê Akada re imperatoriya xwe radigihînin û tevahî bajarên Sumeran bi dest dixin û bin desthilatdariya bajarê Akad de ji nû ve rêxistin kirin. Dewleteke yek destî, navendî û hegemon çêkirin.

Di dîrokê de, imperatoriya destpêkê ya herî mezin û hevgirtî tê nasîn. Yekemîn artêşa bi pergal a dîrokî ava kirine û êrîşî welatên cîran kirine di herêmê de, pergaleke koledariyê ya hişk meşandine. Li hember pergala koledariyê B.Z di salên 2150'an de, qebîleyên arî ên bi navê gûtiyan êrîşî wan kirine û bi bidestxistina bajarê Agadê re dawî li imperatorya Akad anîne.



## WANE 2

# ŞARISTANIYÊN MEZOPOTAMIYA

## BABIL:

Êlên Semîtîk in. Ji sala 2000 B.Z û şûn ve ji başûrê kendavê ber bi Mezopotamya  Jorîn ve koç dikin. Di şûna dewleta Îraqê ya roja me de,  ava bûne. Paytexta wan bajaran Babilê ye. Imperatoriya Babil di sê pêvajoyan re derbas dibe. Babil di salên 1950-1600'î B.Z di dema xwe ya pêşî de, bi awayekî gelekî bi heybet derketiye ser dika dîrokê. Hemorabîyê navdar nîşandeya vê serdemê ye. Zagonên Hemorabî yên ku li ser navê  xweda tên gotin, di bingeha xwe de,  zagonên sezayê ne. Sezaya ku nivîsiye wiha ye,   çav bi çav e û diran bi diran e. Van zagon li ser civakê pir ziyan kirin. Tevî ku têkiliya zagonan bi maf û dadê re jî heye, lê armanca wê ya sereke parastina desthilatdariya dewletê ye.




Dema duyemîn di salên 1600-1300 B.Z de,  bi civakên bakur û rojhilat re bi awayekî hevpar derbas bû (hevgirtinên hîtît û hûriyan vê yekê tîne ziman).


Dema sêyemîn ji salên 600-540 B.Z di encama hevpeymana bi Medan re desthiladariya aşûran hilweşandin. Nebûqetnezar ê ku cara pêşî Cihû mişext kirin nîşaneya vê demê ye.

Di  dema imperatoriya xwe de,  beşeke mezin a Mezopotamiya heya ber Deryaya Spî kirine bin destên xwe. Qiralê wan ê bi navê Hemorabî ji ber ku wî zagon nivîsiye bi navê zagonsazê mezin tê nasîn. Ev qanûnên Hemorabî, di dîrokê de wek makezagonên destpêkê tên pejirandin. Li gorî  van qanûnan, kesê ku sûc kiriye bi sezayên giran

dihat sezakirin. Hişmendiya dewletên mafî ji wan ma ye. Bircên Babil û bexçeyên Babil wek berhemên dîrokê yên wê demê ne. Di roja me de, bermayên wan ma ne.

Babil, di felsefe û zanistê de, pêş dikeve. Pir zanyar û feylezof tên li wir perwerdeyê dibînin. Tê gotin Talesê ku wek bavê felsefeyê tê pejirandin, li wir perwerde dîtiye.

## ASÛR:




Ji êlên Semîtîk in. Piştî salên 2000 B.Z û şûnde, li Mezopotamya hebûna wan xuya dibe. Bajarê Asûr (Şarqat) ava dikin û ji wir belavî herêmê dibin. Di destpêka salên 1100 B.Z de bajarê **Neynewa** dikin paytexta xwe.

Asûrî, nivîsên mîxî ku ji sumeran fêr bûne, tînin bakurê Mezopotamya û Anedolê. Di navbera Mezopotamya û Anedolê de bazirganiyê pêş dixin. Bi navê Karum navendên bazirganiyê ava dikin. Kûltepeyê ku nêzîkî bajarê Keyserî yê Anedolê ye, ji aliyê asûran ve hatiye avakirin. Berhemên ku li wir (Kûltepe) hatine dîtin, berhemên nivîskî yên Anedolê yên dastpêkê ne. Dîsa hin dîroknas dibêjin ku asûran pirtûkxaneya herî kevin çêkirine.

Di bazirganiyê de, pir pêş dikevin. Bazirganên asûran, ji Çînê, heya Anadolê û Misirê bandor kirine.

Li Mezopotamyayê imperatoriyeke mezin ava kiribûn, desthilatdarên asûran zordarî û hovîtiyeke mezin li ser gelên herêmê dimeşandin. Li dijî vê zordariyê gelên herêmê li hev dikin û êrîşî wan dikin. Di sala 612'an B.Z de, dawî li imperatoriya Asûr tînin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Şaristanî çi ye, çawa xwe li ser civakê ferz dike?

2- Ji her demê re wêneyan bînin ku kronolojiya demê çêkin.

3- Imperatoriya Asûr çima û li ser destê kê têk çû.

**WANE 3**

## ŞARISTANIYÊN ANADOLÊ

## HÎTÎT (ETÎ)

Hîtît, ji şaristaniyên herî kevin ên li Anedolê hatine avakirin e. Derdora çemê Hals (Kizilirmak) û Kapadokyayê de ava bûye. Paytexta wê Hatuşaş e. Birêveberiya olî û leşkerî ya hîtîtan yek e û di destê qiral de ye; lê bi navê Pankuş encûmeneke wan heye. **Pankuş** tê wateya piranî. Biryarên girîng di vê encûmenê de, tên guftûgokirin û biryar tên girtin. Ola hîtîtan jî wek ya asûrên Mezopotamyayê pir xwedayî ye. Hîtîtan, hem nivîsên mîxî yên Sumerî û hem jî nivîsên hiyeroglîf yên Misirê bi kar anîne. Li ser desthilatdariya Rojhilata Navînê, bi Misiriyan re şer kirine. Di dawiya şer de B.Z1280, bi navê **Qadiş** peyman çêkirine. Ev peyman, di dîrokê de, peymana nivîskî ya destpêkê ye.

Welatê Hîtîtan ji hêla kanzayan ve pir dewlemend e. Bi taybet kanzayên zîv pir in. Hîtîtan ji van kanzan pir amûrên nû çêkirine, bi wan amûran jiyana xwe hêsantir kirine.

Amûrên şer jî pêş xistine. Erebe di şer de bi kar anîne, ew vedîtinên Hîtîtiya ne.

Civaka Hîtîtan civakeke çînî ye. Çînîtî li wir kûr bûye. Taybet kesên ku di şeran de, dîl hatine girtin di rewşa herî xirab de jiyane û çînên herî jêr ew in. Hin caran van koleyan li dijî serdest û desthilatdaran serhildan kirine, mal û milkê wan dişewitandin.

## FRÎGÎ

Frîgî, di rojavayê Anadolê de, jiyane. Paytexta wan, Gordion e. Jiyana xwe li ser çandinî û lawirvaniyê domandine. Baweriya wan pir xwedayî ye. Xwedawenda wan, Kîbele ye, berdewamiya Înana û Îştar e. Di bikaranînên kanzayan de pir bi pêş ketine.

Frîgî, li hember dagirkeriya asûran, bi Urartuyan re li hev dikin, wek du hêzên sereke li dijî asûran disekinin.

Kimerînên ku ji Qefqasya hatin, dawî li desthilatdariya Frîgiyan anîn.

Civaka Frîgî, civakeke bi çîn bû. Bi taybet kesên ku ji derve hatine û di şer de, dîl ketine dihatin kolekirin û di Çînîtiyan de ew çîna herî jêr bûn.

## LÎDÎ

Lîdî jî li rojavayê Anadolê jiyane. Paytexta wan bajarê Sardes e. Baweriya wan pir xwedayî ye. Cara yekem, dirav dîtine û bi kar anîne. Dîtina diravan, bazirganî hêsantir kiriye û di bazirganiyê de, pêş ketine. Di dîrokê de, cara yekem, ji bo bazirganan bi navê “rêya qiral” rêyeke bazirganiyê çêkirine. Bi vê rêyê, di navbera Anadol û Mezopotamyayê de bazirganî pêşxistine.

## IYONÎ

Iyonî, li rojavayê Anadolê, li ber deriyaya Îceyê jiyane. Paytexta wan tune ye. Ji çend bajaran pêk tê. Mirov dikare bêje dewletên bajarî ne. Baweriya wan pir xwedayî ye. Di bazirganiya deryayan de, pêş ketine. Di deriyaya Spî û deriyaya Reş de, mêtingeriya xwe pêş xistine.

Iyonî, wek dewletên din ne ew qas navend perest bûn. Li gorî dewletên din demokratîktir bûn. Vê rewşê di azadiya ramanê de, pêşketinek çêkir. Di felsefe û zanistê de, pêşketineke mezin çêkir. Di felsefe û bîrkariyê de, Thales Pythagoras, Diogenes, di bijîşkiyê de, Hipokrates di wêje de, Homeros di dîrokê de, Heredotus derketine.

Dîsa Iyoniyan, perestgehên Artemîs, pirtûkxaneya Celsus û holên şanoyan çêkirine. ji Fenîqiyan fêrî alfabeyê bûne û birine Ewrupayê.

## TROYE

Tê gotin ku Troye B.Z 3000-3500 sal berê wek bajarekî li dawiya rojavayê Anadolê hatiye avakirin. Di navbera du parzemîn û du deriyayan de ye. Cihê wê pir stratejîk e. Rêyên bazirganiyê ji wir derbas dibin. Ji ber vê yekê cihekî ku her tim li ser şer çêbûye. Tê gotin ku neh caran ev bajar hatiye xirakirin, şewitandin, an jî dagirkirin.

Piştî hîtîtan, li Anadolê şaristanî dane avakirin, li Anedolê ewlekarî çêbûye. Troye jî wê demê çêdibe. Hin dîroknas dibêjin Troye beşekî hîtîtan e, hin dîroknas jî dibêjin, du gelên cîran in, lê çanda wan wek hev e. Xwedayên wan, wêje û zanistên wan nêzî hev in. Dîsa amûrên bazirganî, berhemên destan nêzîkî hev in. Ji ber vê tê gotin ku her du gel nêzî hev in.

B.Z 1000 salî, hin êlên Trakyayê, ku ji wan re Ahiyewa tê gotin, êrîşî troye dikin. Misirî jî wan êlan re dibêjin êlên deriya. Bi şerekî, Troyeyê bin dixin û dagir dikin. Nivîskarê navdar ê yûnanî, Homeros, ev şer û berxwedanîbi navê destana Odesa nivîsiye.

Bajarên Troye wek keliha şaristaniya Mezopotamyayê ya dawî ye. Heya B.Z 546 hebûna xwe parastiye. B.Z 546ê de persan bajar dagir kirine. Lê nekarîne bajaran bi temamî bixin bin serweriya xwe. Dema Iskenderê Makdonî şerê persan dike, destpêkê tê bajarê Troye û hêza xwe ji wir distîne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di pêşketina mirovahiyê de, bandora şaristaniyên Anadolê çi ne?
2- Di nav Iyonyan de felsefe û zanist çima ew qas bi pêş ket?

## WANE 4

# ŞARISTANIYÊN HINDÊ

## HARAPPA- MOHENJO-DARO

B.Z 3000 sal di qontarên çiyayên Hîmalaya û peravên Ganjê de, civakbûn derdikeve. Ev civakbûn wek berdewamiya civakbûna bakurê Mezopotamyayê ye. Çandinî û lawirvanî li vir pêş dikeve. Bikaranîna kanzayan jî pêş dikeve. Çandiniya genim, ceh pêşketî bû. Tê gotin ku cara yekem, pembo li wir tê çandin. Ji ber ku avhewaya wê baş bû, çandinî bê av çêdibû.

B.Z 2000 sal, li wir civakbûneke nû pêş dikeve. Ev civakbûn li derdora bajaran pêş dikeve. Bi taybet li derdora bajarê Harappa û Mohanje-daro de, kombûn çêdibe. Ev civakbûna li wir, her çi qas xweser be jî lê ji semîtîkan, taybet ji bajarê Urûkê, ji sumeran bandor bûye. Jiyaneke çînîtî li wir pêş dikeve. Weke mînak: Urûk, bajar-dewlet pêş dikeve. Baweriya wan pir xwedayî ye.

## ŞARISTANIYA MISRÊ

Şaristaniya Misrê, li derdorên çemê Nîlê ava bûye. Çemê Nîlê, li ser rêya gundewarên Afrîkayê ye. Bi sedhezaran sal, mirov ji vir çûne û hatine.

Li Misrê çandinî û lawirvanî B.Z 6000 salî, dest pê dike. Ev jî bi bandora Mezopotamyayê pêş dikeve. Çandinî û lawirên ku li Hîlala Zêrîn hatine kedîkirin, belavî Misrê dibin. Misir, hejîrên firawin û hin giyayên din diçînin û tevlî van çandiniyan dikin. Bi çandiniyê re derbasî civaka niştecih dibin. Jin di vê demê de, pêşengtiya civakê dike.

Barîna baranê li Misrê pir kêm e. Çandinî bi giranî li derdora çemê Nîlê çêdibe. Bi demê re cokên avê çêdikin, erdên ku ji çemê Nîlê dûr in av didin û tê de çandiniyê dikin. Ev rewş bi xwe re di nav civakê de, cudahiyê derdixe. Bingehê Çînîtiyê çêdike.

B.Z 3300 salî li Misrê dewlet ava dibe. Ev dewlet jî weke dewletên sumeran dewletên bajaran bûn. Ev dewlet, li bajarê Menfis û Hierakonpolis pêş ketibû. Nekarî li ser Misrê bi giştî desthilatdariya xwe çêke.

Misrê, bi navê hiyeroglîf nivîsek cuda pêş xist, di bijîşkiyê de pêşketinên mezin çêkirin. Dîsa di endeziyarî û astronomiyê de, pêş ketin. Lê bi şaristaniyê re civak parçe kirin û çîn çêkirin. Bi vî awayî civaka xwezayî xira kirin, civaka dijber û civaka şaristanî ava kirin.

## ŞARISTANIYA ÇÎNÊ

Li Çînê, nêzî 4000 B.Z niştecihbûn çêbûye. Ev niştecihbûn, li derdora çemê zer çêbûye. B.Z 2000 sal gund ava kirine, dev ji nêçîrvanî û komkirinê berdane, çandinî dikirin û lawir xwedî dikirin. Pergala berhemên zêde bi eşîrên din re guhartin rûniştî bû. Çîn, her çi qas ji bakur bi îskîtan re, ji başûr bi Mohanje-daro re têkilî danî be jî di nav xwe de, girtî bû.

Di çînê de bajarvanî, koledarî û dewlet bi hev re pêş dikevin. Xanedana Şang, di navbera salên 1766-1122 B.Z dest datîne li ser birêveberiyê û dewleteke koledar ava dike. Ev xanedan di nav civakê de, çîntî û koledariyê kûr dike. Her çi qas taybetiyên wê yên xweser hebin jî wek koloniyeke sumeran pêş dikeve.

Çîniyan li gorî xwe nivîsek pêş xistine. Di zanistên ezmanî de pêş ketine. Salnameya rojê çêkiriye. Ji bo avdanê kenalên avê çêkirine. Ji bo vê jî hendese pêş ketiye. Di bîrkarî de, pêş ketibûn. Kanzayên wek hesin û bronz bi kar tanîn.

B.Z di sedsala 12ê de, di şerê navxweyî de, xanedaneke din rabû, xanedana Şang şikand û desthilatdarî jê stand.

## ŞARISTANIYA AMERÎKAYÊ

Li gorî dîroknas û arkeologan, di parzemîna Amerîka de, mirovan 15-20 hezar sal berê dest bi jiyanê kirine. Li vir jiyaneke koçber û hevbeş jiyane. Ji kilan û malbatan derbasî êlan bûne. Çandinî, an jî lawirvanî pêş nexistine. Ev rewş bi erdnîgariya wir ve girêdayî ye.

B.Z 100 salî, wek federasiyona êlan cara yekem yekîtiyeke xwe çêkirine. Ev yekîtî di bajaran de, pêş dikeve. Bi xwe re çînîtiyê tîne. Destpêkê xwe wek federasyonê bi rêxistin dikin, lê her ku diçe dibe dewlet. Di bajarî de, navendbûnê bi pêş dixin.

Bi pişt re, li Meksîko bi navê Aztek yekîtiyeke din çêdibe. Ev jî xwe wek dewlet bi rêxistin dike, di nexşeyên îro de jî heye.

Li derdora kolombiyayê bi navê Şibja bajarekî ava dikin. Li derdora Perude, bi navê Înka bajarekî ava dikin. Hin bajarên din jî çêdikin. Lê ji van bajaran yek jî nabe hegemon û nikare li ser bajarên din desthilatdariya xwe çêke. Desthilatdarî di bajar de dimîne, nabe navendî. Heta ku dagirkerên Ewropî parzemînên Amerîkayê dagir dikin.

Gelên parzemînên Amerîkayê li gorî derfetên xwe çend cure çandinî û lawirvaniyê pêş xistine, Di zanistê de bi pêş dikevin. Li gorî xwe nivîsekê çêdikin û salnameyê jî çêdikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li ser şaristaniyên Hindê lêkolîn bikin. Bi heval û mamosteyên xwe re nîqaş bikin.
2- Nivîsên Misrê çi bandor li ser şaristaniyê kiriye?
3- Bandora şaristaniya Çînê nîqaş bikin.

# BEŞA 4


1- Zanist û teknolojî
2- Hin zanyar û taybetiyên wan
3- Xeyalên me
4- Mîrasên me yên hevbeş-1
5- Mîrasên me yên hevbeş-2
6- Mîrasên me yên hevbeş-3

## WANE 1

# ZANIST Û TEKNOLOJÎ

Di dîroka mirovahiyê de vedîtin çêbûne. Bi taybet ev vedîtin di Neolîtîkê de, gihiştine asteke pir bilind. Dîroknas û erdkologê birîtanî Gordên Childe vedîtinên Neolotîkiyê wisa şîrove dike: **"Vedîtinên ku di Neolotîkê de hatine dîtin, encax bi vedîtinên dema sermayedariyê re ber hev bikin."** Tiştên ku ji bo jiyana mirovan pêwîst bûn di vê demê de, hatibûn dîtin; van vedîtinan jiyana mirov hêsantir kiriye.

Bi pêşketina mirovan re, ev vedîtin ji hin vedîtinên nû re bûne bingeh. Li ser van vedîtinan vedîtinên din çêbûne. Bi taybet vedîtina nivîs, kaxez, pisule, tekerlek, find û hwd jiyana mirovan pir hêsan kiriye. Li ser van vedîtinan, çapxane, keştî, tirmpêl, ampûl û hwd bi pêş ketine. Bi taybet jî nivîs, kaxez û çapxaneyan zanabûna mirovan pêşdetir bir. Ev vedîtin di jiyan û têkiliyên me de, guhartinên mezin çêdikin. Zanist, teknolojî û civak dema di nav hevsengiyekê de bin, pêşketin û guhartin mezin çêdikin.



Mînak: pêşketina zanistên qada tenduristiyê teknolojiyên nû pêş xistin. Bi van teknolojiyan nexweşî nas kirin û dermankirin hêsantir bû. Vê hişt ku nexweşî zû bên dermankirin û bên başkirin. Dîsa bi nasîna nexweşiyan derzî (lukah) bi pêş ketin, bi vê re rê li belavbûna nexweşiyan hat girtin. Hin nexweşî bi temamî hatin dermankirin û ji holê hatin rakirin.

Ji cihekî çûyîna cihekî din destpêkê bi lingan bû û pir dem digirt, piştre bi lawiran çûn û hatin çêbû, ev hêsantir bû, lê dîsa pir dem digirt. Vedîtina tekerlek û motoran rê li ber çêkirina tirmpêlan vekir. Di roja me de, tirmpêl, keştî, trên, balafir ji bo vî karî tên bikaranîn, çûn û hatin hem kurt bû, hem jî hêsantir bû.

Dîsa wek çûn û hatinê ji herêmeke din xeberstendinê demeke dirêj digirt. Bi rêya lawiran ev kar pêk dihat. Piştre çûn û hatinê hinek din xeberstendin hêsantir kir. Lê di roja me de, bi dîtina bêtêl, telefon û internetê ev kar pir hêsan bûye. Di heman demê de ji cihekî din xeberstendin û bi wan re axaftin çêdibe.



**Li gel van başbûnên teknolojiyê heger bi baldarî neyê bikaranîn, pirsgirêkên cuda çêdike.**

- Di serî de, mirovan ji civakê qut dike.
- Girêdaneke kor bi teknolojiyê ve dide çêkirin.
- Kesên ku bi teknolojiyê ve tên girêdan ji têkiliyên civakê dûr dikevin, jiyaneke xeyalî ya çêkirî ji xwe re çêdikin. Bi taybet bernameyên ku li ser telefon û internêtê tên weşandin, bandoreke neyînî li derûniya mirovan dikin.
- Dîsa agahiyên ku li ser internetê tên belavkirin, di mejiyê mirovan de, tevliheVê çêdikin. Ji bo vî tiştî qirêjiya agahiyan tê gotin.
- Bê hesab bikaranîna telefon û internetê ziyanê dide ewlekariya mirovan.

Di roja me de teknolojî bûye beşek ji jiyana me. Em bixwazin jî bi hêsanî nikarin jê dûr bikevin.

**Wê demê em ê çi bikin?**

- Em ê pir bi baldarî teknolojiyê bi kar bînin.
- Ne dev ji civakbûnê û ne jî dev ji teknolojiyê berdin.
- Di navbera teknolojî û civakbûnê de, hevsengiyekê çêkin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Hûn internêt û telefonê bi çi armancê û çawa bi kar tînin?

2- Tabloya li jêr dagrin.

| **Çi bandora teknolojiyê ya erênî li civakbûnê heye?** | **Çi Bandora teknolojiyê ya neyînî li civakbûnê heye?** |
|---|---|
| | |

## WANE 2

# HIN ZANYAR Û TAYBETIYÊN WAN

Ji kesên ku amûran dibînin û çêdikin re **vedîtiner** tê gotin. Her çi qas îro sedemên vedîtinan hatibin guhartin jî lê di destpêkê de ji bo çareserkirina pirsgirêkên jiyanê bûn. Ji bo wê tê gotin **"pêdivî, dayîka vedîtinê ye."**

Mînak: mirovan despêkê barên giran li ser pişta xwe, bi hêza xwe radikirin. Piştre bi lawiran birin. Di dawiyê de li ser daran birin û li ser vî bingehî dolab çêkirin. Piştre bi lawiran dolab kişandin, wisa erebeyên lawiran afirandin.


Zanist, bi agahiyên rast û bi ceribandinê pêş dikeve. Ê ku vê rêbazê bi kar tînin **zanyar** in. Zanyar lêkolîn dikin, lêkolîna xwe bi zanyarên din re parve dikin. Encama ku gihaştinê ji rexneyan derbas dikin û şaştiyên wê yê heyî kêm dikin.

Lê li vir agahî û şîrove pêwîst e ji hev nayê veqetandin. Heger ji hev bê veqetandin, zanist nîvço dimîne û temam nabe. Agahî û şîrove wek du baskên çûkekê ne. Çawa çûk bi baskekî nikare bifire, zanist jî bi yek alî pêş nakeve. Heger pêş bikeve jî dê ji rastiya civakê ji dada civakê dûr be û ziyanê dide civakê.

Bi taybet di roja me de, pirsgirêkên wisa di zanistê de hene. Ji ber wê zanist her ku bi pêş dikeve, pirsgirêkên civakê zêdetir dibin.
Mînak: Zanista bijîşkiyê pir bi pêş ketiye, lê çare ji nexweşiyan re nedîtiye. Dîsa zanistên aborî pir bi pêş ketine, lê çare ji bêkarbûn an jî feqîrtiyê re nedîtine. Zanistên ramyariyê bi pêş ketine, lê hîn çare ji şeran re nedîtine. Ev hemû bingehên xwe ji veqetandina agahî û şîroveyan digrin.

Agahiyên ji şîroveyê veqetandî, ji felsefeyê jî veqetandî ne. Ji felsefeyê veqetandin, ji jiyanê veqetandin e. Ji bo vê zanistên ku niha bi pêş dikevin ne ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakê ne, ji bo xizmetkirina desthilatdariyê ne. Gotina **"zanist hêz e"** ji vir tê.

## EMER XEYYAM (Omer Xeyam)



Emer Xeyyam, di dema silcûqiyan de jiyaye. Di malbateke xizan de mezin bûye. Bavê wî, çadir çêdikirin. Karê bavê wî dibe paşnavê wî. Xeyyam, an jî çadirçêker.

Xeyyam, li ser bijîşkî, zanistên felekê, geometrî, cebir û bîrkariyên bilind û pêşketî kar kiriye. Li gel van helbestevanî jî kiriye. Bi aliyê xwe yê helbestevanî derket pêş û hat nasîn. Bi taybet di bîrkariya pêşketî û cebirê de nêzî 10 pirtûkan nivîsîne.

Risaleyên Cebir pirtûka wî ya herî tê nasîn e. Di vê pirtûkê de, bi dehan pirsgirêkên bîrkariyê çareser kirine. Salnameya celalî çêkiriye. Salnameya ku çêkiriye, di 5 hezar salan de carekê rojek şaş dibe.

Di vê demê de wezîrên selcûqiyan Nizamûlmulk, xwest ku Xeyyam bike bin kontrola desthilatdariyê. Lê Xeyyam xwe ji desthilatdariyê dûr kir. Ne olperestekî hişk bû; heskirina mirovan ji xwe re bingeh digirt.


## AL- JAZARI (El-Cezarî)



El-Cezarî, bi nasnavê xwe tê nasîn. Di 1136'an de, li Cizîra Botan ji dayîk bûye.

Di pirtûkên xwe de nêzî 50 vedîtinên xwe nivîsîne. Wêneyên wan çêkirine. Di vê pirtûkê de amûrên ku otomatîk kar dikin, robot, (robotên teyrên tawis, robotên fîl), demhijmêrên otomatîk û di der barê endeziyariyê de pir tişt nivîsandiye.

## THOMAS EDISON(Tomas Edîson)




Edîson, di 1847'an de li herêma Ohayo ya Amerîkayê ji dayîk bûye. Di zaroktiya xwe de, nexweşiyê derbas dike û pirsgirêka fêmkirinê dijî. Mamosteyên wî, bi gotina, **"ev zarok kêm aqil e û nikare bixwine"** wî ji dibistanê derdixin. Dayîka wî, di mal de wî perwerde dike. Di zaroktiya xwe de Edîson li hember fîzîk, kîmya û elektirîkê têkiliyeke pir mezin nîşan dide. Lê ji ber xizantiyê nedikarî tiştan çêke. Di dozdeh saliya xwe de, dest bi firotina rojnameyan dike, bi vê jiyana xwe didomîne. Bi pereyên ku bi dest dixe, di mal de ji xwe re laburatuwareke biçûk çêdike. Bi taybet, elektirîk û telgraf pir bala wî dikişînin. Li ser wan kar kiriye. Di 1864'an de, amûrên telgrafê vedibîne. Dîtina telgrafê Edîson di her cihî de daye nasîn. Amûrên cuda cuda çêkirine.

Di 1876'an de, zanyar **Graham Bell** telefon vedîtibû. Edîson, mikrofon li ser telefonê zêde kiriye û telefona roja me çêkiriye. Di 1879'an de Edîson glop vedît. Ev vedîtin û amûrên ku bi elektirîkê kar dikin wek şoreşekê bûn. bandoreke mezin li jiyana mirovan kir.

Edîson bi xwendinê ne bû zanyar. Bi pratîkê, bi karkirinê bû zanyar. Tê gotin ku heya glupên elektirîkê dîtiye 10 hezar ceribandin çêkirine. Ev ji taybetiyên zanyaran ên hevbeş in.

Edîson dibêje: **"Heger min tiştekî 10 hezar car şaş çêkiribe, nayê wateya ku ez bi bin ketime û bê serkeftin im. Ev rewş moralê min xira nake. Ez dizanim, her gava ku bi ser nakeve, ji bo rêya serkeftinê gaveke nû ye."**

## MARIA SKLODOWSKA CURIE (Marî Sikodofeska Kûrî)



Mariya Curie, di 1867'an de, li Polonyayê ji dayîk bûye. Hem diya wê û hem bavê wê mamoste bûn. Ji diya xwe û bavê xwe waneyên destpêkê digire. Fîzîkê pir bala wê kişandibû. Xwendina xwe serkeftî berdewam kiriye. Di dema ku dê biçûya zanîngehê de, zanîngeha Polonyayê xwendekarên jin nedigirtin. Ji ber vê Mariya Curie diçe Fransayê xwendina xwe berdewam dike. Li hember desthilatdariya zilam li ber xwe dide; desthilatdariyê napejirîne.

Maariya Curie, wek hevalên xwe, li peyî hest û xwesteka xwe neçû. Li peyî baweriya xwe çû. Ev jî taybetiyeke zanyaran e.

Li Fransayê li ser uranyum û hin kanzayên din kar dike. Bi navê polonyum elementekî nû dibîne. Bi vê xebata xwe xelata Nobilê distîne. Di dîrokê de, dibe jina yekem ku xelata Nobilê stendiye. Bi xebatên xwe xelata Nobil ya kîmyayê jî distîne. Dibe xwediya du xelatên Nobilê.

Ev rewş, li xweşiya akademiya Fransayê naçe. Endamên akademiya Fransayê hemû zilam in. Akademiya Fransayê, wê ji endamtiyê diavêjin.

Ji jiyana van zanyaran jî diyar dibe ku, mereq, têkilî, heskirin, ked, israrkirin, devjêbernedan û berdewamkirin mirovan bi pêş ve dibin.

**Binketin bi mirovan nade windakirin, dev jê berdan dide windakirin.**

Heger di roja me de zanist û teknolojî ew qas pêş ketibin, bi saya van nêzîkatiyan e.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Taybetiyên zanist û zanyaran çi ne? Bi heval û mamosteyên xwe re guftûgo bikin.

2- Jiyana zanyarekî/ê lêkolîn bikin û li ser jiyan û vedîtinên wî/ê binivîsin.

## WANE 3

# XEYALÊN ME

Mirov li gorî xeyalên xwe azad in. Kesên ku di xeyalên xwe de ne azad bin di jiyana xwe de jî ne azad in. Pêşketin, an jî vedîtin bi xeyalan dest pê dike. Belkî destpêkê li ser van xeyalan, hawirdorên me bi me bikenin, henekên xwe bi me bikin. Weke Edîson, me ji dibistanê derxin. Lê li hemberî hemû zor û zehmetiyan liberxwedan rêbazê binghîn e.

Di 1864'an de, radyoya destpêkê hatibû çêkirin. Piştre pêlên wê hatin dirêjkirin. Di 1901'ê de ji parzemînekê, heya parzemîneke din weşana wê çêkir. Berî 1864'an, bihata gotin ku amûrekî wisa heye, an wê bê çêkirin, her kesî wê henekên xwe pê bikira û bigotana ev dîn bû ye.

Di 1903'an de, cara yekem balafirên bi motor hatin çêkirin. Di ceribandina yekem de ji erdê sê metreyan bilind bû û dozdeh saniyan li hewayê ma, piştre ket. Li ser vê ceribandin pir bûn û ev bû bingeha balafiran. Di 1945'an de cara yekem, komputorê elektronîk û otomotîk hat dîtin. Ew qas agahî di nav komputorekê de kom bûn.



Di 1961'ê de, Rûs çûn asîman. **Kozmonot Yuri Gagarin**(Yûrî Gagarîn) Berê bihata gotin ku mirov dê van tiştan bikin, dê tu kesî ev gotin rastî negirtana.

Em dikarin mînakên bi vî awayî pir bikin. Ji xwe di navbera zanistê û hişmendiyên ku hatine rawestandin de her tim pevçûn heye. Hişmendiyên rawestî, ji nûbûnê re ne vekirî ne, zû bi zû van nûbûnan napejirînin. Ji ber vê, kesên ku weke wan ne hizirin dîn dibînin, henekan bi wan dikin û rast nabînin.

Hûn jî xeyalên xwe biçûk nebînin. Xeyalên xwe mezin bikin. Ev xeyal çi qas bêderfert bibin jî bila bibin, dîsa wan xurt bikin. Piştre li gorî van xeyalên xwe di jiyanê de tev bigerin. Heger em vê pêk bînin dê xeyalên me pêk bên.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

Di derbarê mijarekê de, xeyalên xwe binivîse. Van xeyalên xwe bi heval û mamosteyên xwe re **gotûbêj** bike.

## WANE 4

# MÎRASÊN ME YÊN HEVBEŞ-1

Lê ser rûyê erdê gelên cuda cuda jiyan dikin. Ev gel, berhemên ku çêkirine (madî- rewanî) bi têkiliyên civakê re derbasî gelên din jî bûne. Bi vî awayî ev berhem bûne gerdûnî. Mînak: Ximavê ku **Çîniyan** dît, li hemû cihan belav bû. Çapxaneya Elman **Johannes Gutenberg(Johan Gotinbirg)** dît di nav hemû gelan de, belav bû. Ji ber vê berhemên dîrokî, çandî, wêjeyî, ramyarî felsefeyî û hwd. Wek mîrasên hevbeş ê mirovahiyê tê gotin û tê jimarkirin . Ev mîras bi her awayî tên parastin. Ji bo wê saziyên navdewletî hatin avakirin, da ku van mîrasan biparêzin. Lê ev sazî ku dibin bandora dewletan de ne, li gorî ramyarî û berjewendiyên wan tevdigerin, wek karên ku jixwe re kirine armanc tevnagerin. Ev rewş Rojhilata Navîn û taybet li Kurdistanê pir diyar e.




## MÎRASÊ ZANISTÊ


Zaniyaran, bi xebatên xwe û bi vedîtinên xwe teknolojî pêşxistin û jiyana mirovan hêsantir kirin. Di roja me de, ev vedîtin û teknolojî di her cihî de tên bi karanîn. Vê hiştiye ku ev xebat û vedîtin bibin mîrasê zanistê yê mirovahiyê.

Em hin mîrasên zanistî yê mirovahiyê nas bikin.

**Pisagor(Vîsaxors):** Pisagor, wek bavê hejmaran tê naskirin. Pisagor, hejmaran dibîne û rêz dike. Bi navê xwe teoriyekê pêş dixe. Ev xebat di demek kurt de, li cîhanê belav dibe. Heger em îro hejmaran wisa hêsan bi kar tînin, bi saya Pisagor e. Pisagor bi vê xebata xwe bûye mîrasê zanistên mirovahiyê.




**Arşimet(Arşemîdis):** Arşimet, hêza rakirina avê dît. Ev dîtin bû bingehên çêkirina keştiyan. Li ser deriyayan çûyîn û hatin, bi saya vedîtina Arşimet bû. Bi vedîtina keştiyê çûn û hatin û bazirganî pêş ket.




**Paracelsus(Piraklsos):** Paracelus, li hemberî bijîşkiya kevin sekinî û bijîşkiyek nû pêş xist. Ji kîmye sûd girt. Li ser nexweşiyên mirovan sekinî. Kanzayên kîmyeyî bi kar anî û bingehê dermanan pêş xist. Heger îro, di dermankirina nexweşiyan de derman tên bi kar anîn, ev bi saya Paracellus bû ye. Bi rêbazên xwe farmakolojiyê (zanista dermanan) pêş xist û îro ev li hemû cîhanê tê bi kar anîn.





**Edward Jenner(Êdward Cînîr):** Edward Jenner, luqaha derziyê dît. Bi dîtina derziyan di serî de zarok û mirovahî ji hin nexweşiyan xilas kir. Heger roja me de, hin nexweşî xilas bûne, ev bi vedîtina **Edwar Jenner** ve girêdahî ye. Bi vê dîtina xwe ji bo mirovahiyê xizmetek mezin kir û bû mîrasê hevbeş û zaniyariyê.




**Michael Faraday (Mayîkil Faradayî)**: Michael Faraday, elektirîka cara yekem di elektirîk jiyana rojane de bi kar anî ye. Heger îro karê me ser kerebe dimeşe, em deyndarê **Faraday** in. Cara yekem, motorekî kehrebeyê çêkir. Amûrên elektirîkayê giranî li ser vê hatin çêkirin. Peyvên wek ampêr, elektrot, anot, katot, iyon û hwd. Deyndarê **Faraday** in. Bi van vedîtinên xwe jiyana



mirovan pir hêsan kir. Bi van xebatên xwe ket nava mîrasên mirovahiyê.




**James Clerk Maxwell (Cêmis Klîrk Maksoyîl):** Maxwell, li ser elektirîk û magnetîzma kar kir. Di demek şûn de, bi navê elekt Romagnetîzma her du xiste yek. Bi xebatên xwe rê ji dîtinên pir mezin re vekir. Radyo, televizyon, telefon, internet li ser vê vedîtinê pêş ket. Heger Maxwell,, elektRomagnetîzma nedîtiba, îro me ne dikarî televizyonê temaşe bikin û bi telefonê biaxifin. Bi van xebatên xwe, mejiyê mirovahiyê cih girt û bû mîrasê zanistê.




**Dimitri Mendelev (Dîmîtrî Mendelîf):** Mendelev, li ser kîmya kar kir. Elementên kîmyeyî nas kir û wan rêz kir. Bi navê tabloya kîmyayî tabloyek çêkir. Ew element li gorî giraniya wan rêz kir û bikaranîna wan hêsantir kir.

**Wilhelm Conrad Rontgen (Fîlhelm Konrad Rontgen):** Rontgen, tîrêjên (X) vedît. Bi vê vedîtinê re alavên rontgen pêş xist. alavên rontgen di bijîşkiyê de hat bikaranîn, teşxîskirin û dermanikirina di nexweşiyan de, hat bikaranîn. Bi saya vî alavî, pir nexweşî hatin derman kirin. bijîşkî, di vî milî de, deyndarê **Rontgene**. Rontgen bi vê vedîtinê bû mîrasê mirovahiyê.



**Max Planck (Makis Bilank)**: Max Planck, bingehên kuantumê pêş xist û pîvanên fîzîkê yê wê demê ji bingeh ve guhert. Teoriya kuantum, li ser vê pêş ket. Îro bi navê nanoteknolojî tiştên ku tên çêkirin, bingehên xwe ji wir digre. Max Planck bi pêşxistina kuantumê re di nav mîrasên mirovahiyê de cihê xwe girtiye.



## PIRSÊN NIRXANDINÊ

Li ser zaniyarekî ku bûye mîrasên hevbeş lêkolîn bike. Bi mamoste û hevalên xwe re li ser giftûgo bike.


**WANE 4**

# MÎRASÊN ME YÊN HEVBEŞ(2)


## MÎRASÊN WÊJEYÎ:

Weke mîrasên zanistî, mîrasên wêjeyî jî hene. Hin berhemên wêjeyî hene ku li tevahî dinyayê hatiye belavkirin, bi zimanên cuda cuda hatine wergerandin û li ser mirovan bandoreke mezin kiriye. Ev berhem wek kilasîkên wêjeyî tên dîtin û di mîrasê mirovahiyê de cih digrin.

Em hin berhemên wêjeyî yên ku di mîrasên mirovahiyê de, cih digrin binasin.




**Şer û Aşîtî:** Tolstoy (Tolstoyî) di vê berhema xwe de, şerê Napolyon ku li Waterloyê kiriye nivîsiye. Bandora şer li ser civakê nivîsiye. Ev berhema Tolstoy, bi pir zimanan hatiye wergerandin û wek kilasîkên cîhanê tê dîtin.




**Demir Okçe (Oqeb Elhedîdiya):** Ev berhem ji aliyê Jack London(Cak London) ve hatiye nivîsîn. Di vê berhemê de, êşên karkeran nivîsîne. Ev berhem jî bi çend zimanan hatiye wergerandin.

**Belengaz:** Ev berhem ji aliyê nivîskarê fransî Viktor Hogo(Vîktor Hogo) ve hatiye nivîsîn. Di vê berhemê de, têkiliyên mirovan, xizantî û liberxwedan nivîsîne.



## Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî, nivîskar, helbestvan û feylesûfê herî mezin ê gelê kurd tê nasîn. Xanî, di wêje û toreya kurdî de weke stûneke bingehîn tê pejirandin. Xanî, wêjevan, zanyar, rewşenbîr û damezrînerê ramana serxwebûn û azadiya gelê xwe tê dîtin. Ehmedê Xanî, bi xwe dîroka jidayîkbûna xwe di vê malikê de diyar dike.



"Lewra ku dema ji xeybê fik bû
Tarîx hezar û şêst û yek bû"

Berhemên Ehmedê Xanî

1. Destana Mem û Zînê
2. Nûbihara biçûkan (ferhengoka fêrkirina zarokan)
3. Eqîda Îmanê
4. Dîwana Helbestan

## Melayê Cizîrî

Di dîroka Kurdan de, yek ji kesên girîngtirîn "Melayê Cizîrî" ye. Mela hem bi helbestên xwe hem jî bi raman û baweriya xwe di dilê Kurdan de xwedî cihekî taybet e.




Melayê Cizîrî barkir û dîwaneke binirx a bi navê (Eleqd Elcewherî) li pey xwe hişt, gelek helbestên wî winda bûne û heta roja me ya îro nehatine dîtin.

# MÎRASÊN FELSEFÎ


Di nav her gelî de, nêrînên cuda cuda derketine. Hin ji van nêrînan bandor li gelên din jî kirine. Bi demê re ev nêrîn bûne malên giştî û di mîrasê mirovahiyê de cihê xwe girtine.

**Hin mînakên hizirî binasin:**

**Aristo û Eflaton (Platon)** pir bandor li mirovan kirine. Heya roja me bandora wan li ser hizirandin û felsefeyê heye. Her çi qas bi xwe yûnanî bin jî ji felsefeya Rojhilatê bandor bûne. Ekolên idealizm û materyalizmê pêş xistine. Bi xebatên xwe di mîrasên mirovahiyê yên felsefeyê de cih girtine.




**Aristo**



**Eflaton**

**Sokrat, Zerdeşt û Buda:** Felsefeya sicê pêş xistine û bi vê felsefeyê li ser pir kesan bandor kirine. Dema felsefeya sicî tê gotin, destpêkê ev tên hizirê mirovan.



**Sokrat**



**Zerdeşt**



**Buda**

**Şehabettin Suhreverdi (Şîhabdîn Sehrûrdî):**


Felsefe û hizrandineke Rojhilata Navînê bi pêş xistiye. Bi felsefeya ronahî di mîrasê felsefeyê de, cihê xwe girtiye.



**Voltaire (Voltîr):** Voltaireyê Fransî jî di hizrandinê de cihakî girîng digire. Bi taybet azadiya hizir bi pêş xistiye. Bi gotina **“ez tevlî nêrînên we nabim, lê ku hûn nêrînên xwe bêjin canê xwe didim”** azadiya ramanî nîşan kiriye. Bi vê di mîrasên hizirînê de cih girtiye.



**Karl Marks (Karil Markis):** Karl Marksê Elmanî, di civaknasî, felsefe, dîrok û aboriyê de zanyarekî mezin e. Bi çavên bindestan dîrok ji nû ve şîrove kiriye û li hember sermayedariyê bingehê pergala sosyalîzmê daniye. Civaknasî û felsefeya karker û bindestan çêkiriye. Bandoreke mezin li civakê kiriye û di nav mîrasên hizirînê de cihê xwe girtiye.



## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Dema mîrasên mirov ên hevbeş tê gotin çi tê mejiyê we?
2- Çend mînakan li ser mîrasên zanistî lêkolîn bikin, bi heval û mamosteyên xwe re nîqaş bikin.
3- Çend mînakên mîrasên wêjeyî lêkolîn bikin.
4- Çend mînakên mîrasên felsefî lêkolîn bikin, bi mamoste û hevalên xwe re guftûgo bikin.

## WANE 5


# MÎRASÊN ME YÊN HEVBEŞ-3

## MÎRASÊN HUNERÎ

Mirov li kur jiyaye li wir bi dehan berhem çêkirine. Di Neolotîkê de, civakê bi taybet di perestgehên xwe de ev tişt çêkirine. Grêreş yek ji wan cihan e. Lê bi pêşketina şaristaniyê re, qiralan bi zor li ser navê xwe berhem dane çêkirin. Di serî de li Mezopotamya, Anadolê, Çîn, Misr û Hindê berhemên wisa hatine çêkirin. Ev berhem bi keda koleyan hatine çêkirin.

Ji wan berhemên ku mirovahiyê wek xweşikatiya Cîhanê bi nav kiriye wisa ne:

### 1- Piramîtên Misrê:



Li Misrê bi dehan pramît hene. Ji bo her fironekî piramîtek hatiye çêkirin. Lê di nav wan de, piramîtê **Keops** weke mîrasê hevbeş hatiye pejirandin. Ev piramît B.Z 2560 salî ji aliyê fironiyên **Khufu (keops)** ve hatiye çêkirin. Tê texmînkirin ku ev piramît di 20 salan de hatiye çêkirin. Dema ev piramît hatiye çêkirin bilindahiya wî 145.75 m bûye. Heya sedsala 20ê li ser rûyê erdê avahiyên herî bilind e. Ev piramît niha bi temamî hîn li ser xwe ye.


### 2- Baxçeyên Babilê

Baxçeyên Babilê, B.Z sedsala 7ê qiralê babilî Nabukadnazar daye çêkirin. Nebukadnazar ev baxçe ji bo hevjîna xwe daye çêkirin. Di nav sehrayê de weke buhiştekê hatiye avakirin. Ji çend qatan pêk tê. Pir cure şînatî tê de hatine çandin.



Tu berhemên van baxçeyan negahiştine roja me. Hin erdkologan, li bakurê qesra babilan lêkolîn kirine. Li wir, hin avayihên balkêş dîtine. Axa bexçeyên Babil tê guftûgokirin.

Lê wêje û wênesaziyê di derbarê van baxçeyan de pir tişt nivîsîne û xêz kirine. Bi piranî agahiyên ku li ser van baxçeyan hene, xwe dispêrin gotinên erdnîgarnas **Strabo**.



## 3- Peykerên Zeus

Peykerên Zeus, B.Z di sala 450’ê de li Olimpia hatiye çêkirin. Binçîna peykerî nêzî 6-5 metreyan e. Bilindahiya peykerî 12 metre ye. Li ser textekî bi zêr û bi kanzayên binirx hatiye çêkirin. Di şewatekê de tune bûye.

## 4- Peykerên Rodosê



Peykera Rodosê, B.Z 282’ê de hatiye çêkirin. Encax di 12 salan de hatiye bidawîkirin. Li ser navê xwedayê rokê Heliosê hatiye çêkirin. Bilindahiya wî 32 metre ye. Ji bronzê hatiye çêkirin. Lê bi kevir û hesin hatiye destek kirin. Di nava 56 salan de xira bûye. B.Z 226’an di erdhejekê de ev peyker şikestiye. Li ser gotinên rahiban, ev peyker ji nû ve ne hatiye çêkirin. Nêzî 900 salî wisa xirabe maye. Dema artêşên ereban, girava Rodosê dagir dikin, bermahiyên vî peykerî difiroşin, bazirganekî cihû.

## 5- Fenerên Iskenderiyê



Ji bo deriya rê nîşan bide, di girava Pharos de hatiye avakirin. Projeya vê fenerê yek ji fermandarên Iskender Ptolemy Soter B.Z 290’ê, daye destpêkirin. Lê di dema wî de, bi dawî nebûye, kurê wî Vû fenerê temam dike. Ev fener 166 metreyan bilind e. Heya roja me, di nav fenerên ku hatine çêkirin de, ya herî bilind e. bazirganê Yewnanî **Sostratus** Mezaxtinên fenerê, girtine ser milên xwe. Di bilindahiya fenerê de, neynik bi kar anîne. Rojê ev neynik, bi tîrêjên rojê diçirisin. Şev ji ber van neynikan agir hatiye pêxistin û ronahiya wan ji 50 km xuya kiriye. Di erdhejan de ev fener xira bûye. Herî dawî qiralê memlukiyan **Kait-bay**, xirabeyên fenerê bi temamî ji holê rakirine.

## 6- Gora Qiral Mausollos



Gora qiral Mausollos, B.Z 350’ê , ji aliyê jin û xwîşkên qiral ve hatiye çêkirin. Bilindahiya gora qiral, 45 metre ye. Li ser çar stûnan wek platformekê hatiye avakirin. Di her aliyê wê de, peykerekî cuda heye. Ev peyker ne yê xwedayan in, yê mirov û lawiran in. Ji ber vê girîngiya wê heye. Demeke dirêj gora qiral saxlem maye. Lê dema şervanên xaçperestan hatin herêmê, gora qiral xira kirin û bi kevirên wê sûr çêkirin. Di roja me de bermahiyên wê nemane.

### 7- Perestgehên Artemis

Perestgehên Artemis, li rojavayê Anadolê, li herêmên Efesê ne. Tê gotin ku B.Z di sedsala 7'an de, hatine çêkirin. Ev perestgeh bi temamî ji mermeran hatine çêkirin. Di destpêkê de cihê pîroz û cihê bazirganiyê bû. Ango, hem bazar, hem jî cihê perestinê bûn. Lê di roja me de, ji van perestgehan ji bilî çend parçeyên mermer nemane.



Bi pêşengtiya Unesco, berhemên çandî yên mirovahiyê ji nû ve hatine diyarkirin. Bi rêya teknîkê bi beşdarbûna milyonan nûkirinek çêbûye.

**Ew jî ev in:**

1- Petra: Bajarê kevnar yê li Urdunê
2- Sedên Çînî
3- Peykerê Mesîh Îsa ku li Brazîl e
4- Machu Picchu(matşû bêtşû) bajarê kevnar ê ku li Peru ye
5- Piramîdên bi navê Chichen Itza ku yên li Meksîkê
6- Colezyomê ku li bajarê Roma yê li Îtaliyayê
7- Tacmahal li Hindê ye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

Mîrasên hunerî çi ne? Li derdora we mîrasên hunerî hene yan na lêkolîn bikin.

## Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| **Rezber** | | | - Lêveger<br>- Pirtûka Zanistên civakî<br>- Kes û malbat | -Di civakbûnê de rola sazîbûnê |
| **Cotmeh** | Maf û erkên me | Mafên zarokan | Di nav dewletan de parastina zarokan | Gav bi gav Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê |
| **Mijdar** | Bihara gelan û raperînan | Şoreşa Rojava | Pergala fedrasyona Bakur û Rojhilatê Sûrayeyê | - Pergala rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûryeyê<br>- Şehîdên me |
| **Berfanbar** | - Çawa dijîn<br>- Çandinî-1 | Çandinî-2 | - lawirvanî<br>- Daristan | pîşesazî |
| **Rêbendan** | Têkiliyên aborî û pîşeyan | Nirxandin | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| **Reşemeh** | - Cihê ku em lê dijîn<br>- Avhewa û bandorên wê li ser jiyanê | Şênî û bicihbûn | Bobelatên xwezayî | Herikandina dîrokê ya dijberî şaristaniyê |
| **Avdar** | Şaristaniyên Mezopotamyayê | Şaristaniyên Anadolê | Şaristaniyên din | Zanist û teknolojî |
| **Cotan** | Hin zanyar û taybetiyên wan | Xeyalên me | Mîrasên me yên hevbeş-1 | Mîrasên me yên hevbeş-2 |
| **Gulan** | Mîrasên me yên hevbeş-3 | Nirxandin | | |